



Birîn cebar nabe û hêvî namire...

Rüpel 6-9

Nûcuya Samî Bîrbang

Berdevkên şer
dawî li nîqaşa
aştiyê anîn

Rüpel 3

Roger Lescot

Analîzeke lêkolînî
li ser Destana
Memê Alan (2)

Rüpel 4-5

Gotara A. Melik Firat

Tu kê
diteqilînî,
binê wî vala ye!

Rüpel 13

NAVEROK



6

Necmedin Xulamî: Huner rengvedana jiyanê ye



7

M. Agirî: Aysel winda kirin, lê cihê wê vala nema



11

Edla Deniz: Bîranîna Hüseyin Deniz

Ji Xwendevan

BI rastî di pey qutbuna MED-TV'î de rawestana weşana Azadiya Welat ji giraniyeke mezin li ser gelê kurd hişt. Di vê demê de bi we weşana Azadiya Welat em pir këfxweş in.

Daxwaz û baweriya me ew e ku di nêzîk de emê bi weşana MED-TV'î ji dilşad bibin, em bi çar çavan li benda MED-TV'ye ne.

Bi silavên şoşgerî.

M.KEREM

GELÎ Xebatkarên Azadiya WELAT pêşî ez silâven xwe ji we hemû xebat-karan re bi dîlxweşî rîdikim.

Ji ber ku di mejîyê min de têkilhevi hene ku ez zêde nameya xwe ya yeke-min de tu tiştî nânivisînim: Ji ber vi qasî ji, min bibexşînin. Heta rojên azadiyê her dem bimînin di xweşîye de.

AZAD JIYAN/ANKARA

AZADI û welat du heb peyvîn pir xweş in. Lé bi dest xistin pir ne hêsan e. Ji bo miroveki an ji neteweyekê ji azadiyê birûmetir tiştîk tune. Gelê kurd ev çend sal e ji bo azadiya xwe rabûye ser piyan; ji bo azadiyê ci pêwist bê dike. Ji bo hisyarbûnê kêt çiqas sixul kiribe û berdêl dabe ew e xwedî qedr û rûmet. Ji bo hisyarbûna gel, divê ew zimanê xwe bi kar bîne, ne zimanê bîyanan. Ji bo vê yekê Azadiya Welat ji barê giran hilgirtiye ser milen xwe. Hêviya me ev e ku bi ser bikeve.

BAHATTIN/STENBOL

W

Hêvî vejandin

MEHMET GEMSİZ

Diroka gelan bi bûyerên girîng da-girtî ne. Ev bûyer, ji bo wan hem erêniyê ifade dikin û hem ji ne-yîniyê. Gelê me gava ku bûyereke ne baş û neyînî diqewime navê roja ku bûyer tê de çêbûye datîne "roja reş." Nexwe, çaxa ku bûyer xwediyê wesa erêniyê be, pêwist e ku navê wê rojê ji bibe "roja spî".

Çawa ku me got dîroka gelan bi bûyer-en erêni û neyînî tîjî ne, ya gelê me ji wisan e. Îcar hin ji wan ji bo gelan wekî xala werçerxê ne. Ji bo me ji, 15'ê Gelawêjê xwediyê roleke welê ye.

Navê wê hilpişkînê, wê pêngavê mîna guleya yekemîn ji di nav rûpelên dîroka me de cihê xwe girtiye. Guleyê, kesayetiya kole, kesayetiya mîtingeritîyê kuşt û rî ji kesayetiya azad re vekir ku vejî.

Ev qonax hê ji berdewam e. Ne kesa-

yetiya kole tam ji holê rabûye û ne ji kesayetiye hîsaza û serbilind, li gorî xwes-tinê, tam derketine pêşberî mijok, kedx-war û stemkaran.

Wekî me li jorê got, têkoşîn didome. Ev yek heta bi hetayê ye. Mebest tenê ne bidestxistina iktîdarê ye. Guherîna wê ya şeweyî û naverokî ye ji. Jixwe ya girîng ji ev e.

Daxwazên bîryara pêngavê hin hatine cih. Rê hatine vekirin, berhem bi dest ketîne. Şoreş di riya xwe de dimeş; ji rî averêbûn nîn e. Ziman bi xeberdanê ketîne, deng ji berê fesihtir e û ji berê bêh-tir tê bihiştin. Ev yek tev ji ber xurtbûyina ruhê hilpişkîna 15'ê Gelawêjê ne. Ev ruh û hêvî bi her kesekî kurdê xwenas û xî-retkîş re çêbûye. Ew li ku dera cihanê dibibe bila bibe. Lewma îro rejîma kemalî ne rasterê be ji, tiştinan bi lêv dike. Hikûmet

tên û diçin. Lé tev bi prensibên iktîdarê ve girêdayî ne. Sondxwariyê wê ne. Hikûmet bi tenê navgîn in.

Ev destpêk e. Ku îro rasterê bi PKK'ê re rûnenin, sibehê wê pê re rûnin. Ev ji qanûneke têkoşînan e, qanûneke ser e. Ji terefan heta ku yek tam neşikê, derbe nexwe, xwe nade ber lihevhatinê.

Her çiqas dewlet lê dixe bîte ku nim-nendeyekî sexte yê kurdan ji xwe re peyda bike ji, nim-nendeyê rasteqîn li holê ye. Eger aliyên ser bi hev re rûnenin, yek yê din înakar bike ne gengaz e ku aştiyek-e mayinde pêk were.

Çendî rejîma kemalî li xwe mikur na-yê û bi awayekî eşkere nabîje ku di vî şerî de bi ser neketiye û di her warî de têk çûye ji, rastî ev e.

Di encama 12 salî de, ji her alî ve şer-peze bûye, ji pertavê ketiye. Du rî bi te-nê li ber rayedarên tirk mane: An dê şer bidomînîn û hin bêhtir perşan bibin û kanêñ xwe biçikînin, ku ev kan hem ma-dî û hem ji manewî ne, an ji ew dê xwe bidine ber lihevhatinê.

Em li virê gotineke pêşiyê xwe bi bîr bînin: Nîvê zerarê nîvê karê ye.

Hilpişkîna evîna jiyanê:

Livbaziya Dihê û Şemzînan daxuyand ku şervanên evînê çiqas bi jiyanê ve girêdayî ne. Lewre wan di 15'ê gelawêjê de fer-mana dijmin a mirinê standin.

15'ê Gelawêjê

Roj ji qefesa zîndanê, ji êsîrti-yê rizgar bû; zincîren koletiya hezar salî qetand, qeyda bindestiyê şikand û ji xewa mirinê û xewna bêdiliyê hisyar bû. Perdeyên reş, ji ewrê tarî qelişin, ronahî ji dayika xwe bû, çavên xwe yên bi hêviya jiyanekê nû dagirtî, ji cihanê re vekir û bi rûyekî ges û çavên kildayî kenokên jiyanê ji tîrêjan, li her alî belav dike û rojbaş dibêje ji jiyanekê nû re. Bi tîrêjan, berfîn serê çiya dihelin û jê kaniyêن avê dipijiqin. Av ji, ji serê çiya, rî ji xwe re vedike.

Av wan asteng û avbendên ku li pêşîya wê hatibûn avakirin ji holê radike. Riya azadiyê ji xwe re vedike û bi hêz diherike û dibe lehiya jiyanê. Dime-se, tu astengan nas nake, tevan ji pêşîya xwe radike. Bi lez newal û gelîyan derbas dike, dike xuşexus û êdi dilê pelên wê di sînga wê de hilnayê, nasekine ku zû xwe bigêhijîne erdê, axa tî û av hev wekî dildaran hembêz dîkin. Av ji, bi hesret her du lîvîn erdê radimîse.

Erd, a ku tiyê azadiyê ye, dilê xwe ji avê re vediye û wê bi eşq û bi ken di hinav de hembêz dike. Dide avdan û di sînga xwe de hêviya jiyanê hêşin dike. Ev erdê ku ji tîbûnê kezebehşîfî bû, cerg bi birîna qelişibû, bi vê avê, hênik dibe û birîn dikeve hev. Lewre ev ava jiyanê ye, merhema jiyan û birînê ye. Erd bi vê kefenê mirinê ji ser xwe diavêje û

kirasê jiyanê ji mîrg û giyayê hêşin ên bi rengê bîharê neqîş bûye li ser xwe di-şidîne. Biskêñ xwe yên ji rengê kesk, sor û zer ba dide. Dibe bûka xortan. Bi vê bedewbûna xwe, dibe evîndara ciwanan, yên ku li ser wê têne şehîdkirin û ji bo jiyanâ wê canê xwe dikin xelat. Bi vî awayî, eşq û evîna xwe ji jiyanê re li ser sîngâ wê tînîn ziman.

Bayê şoşê pêl bi pêl çar aliyê Me-zopotamyayê dipêce, digere û ne tenê mirovî kurd dixe bin bandora xwe, te-vayî cihan û mirovatîyê xistiye bir bandor xwe. Bayê serxwebûn û azadiyê, li çiyan, li bajaran, li her welatî digere û agirê hêviya mirovatîyê hênik dike. Di dil de, evînê ges dike û li jiyanâ cilmissî silav dike û reng didê.

Wekî ku Zerdeş di pirtûka Avestayê de anîye ziman; roj, av, ax û ba elemen-tên jiyanê ne. Ew her car element ji, îro bi xwîn û xwêdana berxwedanvanên hemdem, bi tivinga zarokên Medyayê, yên nûjen û şervanên Ahura-Mazda ca-reke din ji ser xaka Mezopotamyayê gi-hîştin. Li Kurdistanê, ba nedilivî, roj bê-tîrêj bû, şev bêstêrk û bêheyv bû, xak bêav û çemên miçiqî ji rengê sor dihe-rikîn. Sal bêbihar, gulistan bêgul, gul ji stûşikestî di bin potinan de bêrêng û bê-bêhn bû. Bilbil ji sêwî û mihacir bû. Destê bûk û zavayan ji hev kirin, di na-va dilen evîndaran de, di zeviyan de ma-yinan çandin, sînga dayikan ziwa û hisk kirin, zarok ji, ji kaniyê jiyanê bi dûr xistin û di nava birayan de dijberî çeki-rin. Zozan hatibûn firotin û bênenîgiz û sosin bûn. Daristan bêdar, dar ji bêreh, bêpel û şaxşikestî bûn. Hêstir bêdeng dianîn xwarê, lorî û hawar bêdeng bûn. Her tişt; mirov, sewal, çem, erd û her zindiyek li ser sînga nîştiman di bêden-giya mirinê de bêdeng dinalîn û di bin taritiya zilm û zorê de bêdeng diqîrîn. Yanê, li welatê me jiyan bûbû mirin, mirin ji bûbû jiyan. Kurd, bêkezeb, ji er-dê xwe, ji evîna xwe direvî wekî ku ca-wa ji webayê bireve. Lewre jiyan jê re tawan bû. Vê rewşê heya teqîna guleya yekemîn dom kir.

Tevgera jiyanê; tov di erdê de çand, bû hêza berxwedan û hêviyê ji jar û bin-destan re. Hezkirina jiyanê, di cergê wan de ji nû ve hêşin û ges kir. Belê liv-baziya Dihê û Şemzînan daxuyand ku şervanên evînê çiqas bi jiyanê ve girêdayî ne. Lewre wan di 15'ê gelawêjê de fer-mana dijmin a mirinê standin.

MEHMED MEMEDÎ



LI AMEDÊ televizyona Can-TV, stranê bi kurdî dîweshîne. Pişti ku DGM'ya Amede der heqê weşanên wê de lêpirsin vekir, şcar JF RTÜK'ê du cezayê rawestandina weşanê danê. Xwediyê Can-TV'yê Nevzat Bingöl serf li dadgeha bilind da, ji bo ku bîryara RTÜK'ê betal bibe. Nevzat Bingöl di axafîna xwe ya li ser vê mijarê de diyar kir ku gelê Amede weşanên bi kurdî dixwaze. Wî got: "Li ser daxwaza gel, me muzika bi kurdî weşand. Li gorî lêkôlînan %75'ê gelê herêmê, pişti weşana bi kurdî bûne guhdarêna radyoya me, her wiha rîjeya teşavevanen tv'ya me %45 e."



WEŞANA Komeleya Bîjîşkê Amerîkî (JAMA) dide zanîn ku bîjîşkê tîrki ber pest û pêkutîyan newêrin raporê rast bîdin kesen ku işkence ditîne. Ji Bîjîşkê ji bo Mafen Mirovan Vincent Iscopino diyar dike ku, rîxistina wan di dema sempozüma "Mafen Mirovan û Berpîrsiya Bîjîşkan" de bi hinek bîjîşkê Tîrkiyeyê re anket çêkîriye, ji wê JF diyar dibe ku bîjîşk newêrin raporê rast bidin. Li gorî nîvîse bi taybetî li Kurdistanê polis rasterast bîjîşkan tehdîl dîkin. Her wiha tê gotin ku Komeleya Bîjîşkê Tîrki heta dawîya sala 1995'an der barê 60-70 bîjîşkan de lêpirsin kîriye.

NÛCE

Berdevkêñ ser dawî li nîqaşa aştiyê anîn


Di destpêkê de hem artêşê, hem jî DYP'ê helwesteke nerm nîşan dan, lê paşê ji nişka ve helwesta xwe guhertin, Amerîkayê dest avêt mijarê, bi riya hêzên di bin bandora xwe de, ev hewldan nîvco hişt. Edî di bin desthilatiya vê hikûmetê de edî hewldanen bi vî rengî dom nakin.



Mahir Kaynak



Mahmut Şakar



İsmail Nacar

Kêşeya kurdî heftiya çûyî dîsa rojeva Tîrkiyeyê dagirt. Ev 12 sal in ku şerekî kirêt li hemberî gelê kurd tê meşandin, di vî şerî de bi hezaran ciwanê kurd û tîrki hatin kuştin, lê rayedarêna dewletê her tim ji qirkirin û tunekirinê pêve qala tiştekî nedikirin. Pişti ku bi navbertiya hinek rewşenbiran rojiyên mirinê dawî lê hat, di destpêka meha gelawêjê de, hevdîtinâ di navbera Berdevkê Komîteya Aşî, Biratî û Hevgirtinê İsmail Nacar û Serokwezîr Necmettin Erbakan de eşkere bû; pişti vê hevdîtinê çareseriya siyasi rojev dagirt.

Heftiyekê bi giştî li Tîrkiyeyê guftûgoya di navbera PKK'ê û dewleta tîrki de hate nîqaşkirin, di dawîye de dîsa rêvèberen şerê taybetî pê li frînê kirin, berê mijarê guhertin. Li ser vê yekê Serokwezîr jî di nav de desthilatdarêna tîrki helwesta xwe guhertin, hatin ser xeta berê. Heta İsmail Nacar bi xwe jî pişti van daxuyaniyê tûj, xwe da hev.

Li aliye din derdorêna kurd ji bili HADEP û DBP'ê, daxuyaniyeke fermî nedan, hewldanen me yên ji bo xwegîhandina sazî û şexsiyeten kurd, neçûn şerî. Li gorî hin daxuyaniyê ku di çapemeniya tîrki de cih girtin, van jî pêvajoyê bigire.

Di demeke kin de wê İHD û Mazlum-Der bîn ba hev û ji bo pêkanîna insiyatîfeke berfireh dest bi hin çalakîyan bikin. Divê her kes karibe dîtinêna xwe ji bo çareseriye pêşkêş bike, her kes ji aştiyê tiştekî fêm dike, wê li gorî xwe şirove dike, lê aşî ji bo piraniya civakê pêwistiyek e.

Ser zêdetir bandoreke neyînî li gelê herêmê dike, ji ber vê yekê ji gelê herêmê ji her kes zêdetir li doza aştiyê xwedî derdikeve. Hewlêna aştiyê morale didin gel.

Mahir Kaynak:

"Amerîkayê ev hewldan nîvco hişt"

Ez tim bi çavekî baş li hewlêna diyalogê dinêrim, lê wisa xuya ye ku ev hewldana birêz Erbakan hate astengkiyin. Li gorî texmîna min di rojên pêş de edî hewldanen bi vî rengî dom nakin; sedema vê yekê jî ev e: Birêz Erbakan li aliye kî dixwaze bi kurdan re bikeve gotübêjê, li aliye din diçe serdana Îranê, ev her du tiş li hev nakin. Amerîka rî nade desthilatdariya ku bi Îranê re dide û distîne da ku ew vê kîşeyê çareseriye bike, bi vî awayî jî prestijî qezencike.

Di destpêkê de hem artêşê, hem jî DYP'ê helwesteke nerm nîşan dan, lê paşê ji nişka ve helwesta xwe guhertin, Amerîkayê dest avêt mijarê bi riya hêzên di bin bandora xwe de, ev hewldan nîvco hişt. Edî di bin desthilatiya vê hikûmetê de edî hewldanen bi vî rengî dom nakin.

Lê, divê ji vê sün ve jî derdorêna li



ARGK'ê daxwaza berdانا leşkeren esîr bi erêni bersivand, lê rayedarêna tîr dîsa vegerin ser xeta qirkirinê.

Serokê İHD'ya Amede Mahmut Şakar:

"Pêşî divê bingeha nîqaşê çêbibe"

Divê riya nîqaşê vebe, kesê ku dîtinêna xwe bîne zîmîn divê pest û pêkuti lê

nebe. Efûyeke giştî wê di vê qonaxê de bi wate be, ji bo afirandina atmosfereke baştır. Pişti re guhertina zagonan divê bê rojevê. Ev ne meseleya deh salan, belkî ya sed salî ye, ne rast e ku mirov bi hin şert û mercan rî li ber pêvajoyê bigire.

Ji iro pêve emê hinekî bisekinin, li rewşê binêrin. Daxuyaniya Çiller û Ağar jî, ya Gölhan û Aktuna jî normal in, li cihekî ku lê şer dom bike, mirov kare ji rayedarêna dewletê çi hêvî bike?

Wekî destpêk heke PKK aştiyê dixwaze divê van gavan biavêje:

Hewce ye, qet êrişen çekdarî pêk neyîne; hêzên çekdar nexe nava Tîrkiyeyê û çi li hundir, çi jî li derve hêzan kom neke, wan nede hev. Her wiha di demeke kin de leşkeren di destê xwe de berde. Pişti vê yekê ançax em karin girankirina operasyonan pêşniyaz bikin; ew jî li dûv nermbûna raya giştî. Dema hinekî aramî çêbibe, wê çaxê mirov karin bi mantiqî bifikirin, ji hisibûnê dûr bikevin. Niha di warê berdانا leşkeren de hin hewlêna baş hene, wekî destpêk ev tiş dilê me xweş dike.

Li çi deverê, dema dewlet hêzeke çekdar li dijî xwe bibîne, divê biçe ser. Kés nikare bibêje, operasyonan rawestînin. Ez bi xwe jî dibêjim bila artêş karê xwe bidomîne, lê nabe ku dewlet bi dilovanî nêzîkî meseleye bibe. Dîsa jî gelek reaksiyon tê, her yek navekî li min dike. Lewre ji divê insiyatîfa sivil li rastî be, xwe nede tu alî, ez bangî her kesî dikim ku piştevaniya komîteya me bikin. Aliye kurd jî heke girîngiyê dide hewlêna min û aştiyê dixwaze wê van gavênu min gotine, biavêje.

SAMÎ BERBANG

Destana Memê Alan (2)

ROGER LESCOT

Beriya vê şahiyê, wê ji evîndârê xwe re dabû zanîn û gotibû ku rojê daweta wê nêzîk in. Zariadres zûka di gel paytûngerê xwe yê şer, ji wargeha xwe vediqete û berê xwe dide qesra Odatisê. Bi paytûna xwe ya herbê, di pir welatan re derbas dibe û nêzîkî 800 qonax rê dibire. Gava digihe bajarê ku lê daweta Odatisê tê kirin, paytûna xwe tevî paytûnger li cihekî dihêle û bi lezgînî xwe digihîne cihê dawetê. Kêliya dikeve hundir, Odatisê li ser piyan li pêsiya mîvanan dibîne. Keçikê hêdî hêdî piyan dadigirt û digiriya. Xwe digihîne balê û bi dengekî nerm jê re dibêje: "Odatis delala min, weke ku te dixwest ev e ez hatim. Ez Zariadres im."

Bi dîtina vî biyaniyê çeleng, ku eynî mîna xeyala xewna wê bû, ji kîfa ci maye bifire, bi dilgeşîyeke mezin piyanê dide destê wî. Zariadres piyanê ji destê wê digire û dibe ber devê xwe. Dû re, bi milê keçikê digire, ji qesrê derdice, wê dibe li paytûna xwe siwar dike û direvîne. Xulam û xizmetkar ku haya wan ji her tişî hebû, ci astengî li ber wan dernexistin. Gava Homartes pirsa keça xwe li wan kir, xwe li nezanînê girêdan û gotin ku haya wan ji tu tişî tune."


Barbarê Asyayê pir ji vê çirokê hez dikirin û diwarên perestgeh, qesr û xaniyên xwe yên taybet, bi wêne û sûretên serpêhatiyen vê çirokê dixemilandin. Piranya mîr û padışan jî, navê keçen xwe datanîn Odatis.

Tê dîtin ku bi gişî romana Chares û çiroka me ji aliyê naverokê ve, pir dişibin hev. Mem û Zariadres ji hev ne dûr in, ger Zariadres kurê Afrodît û Adonîs e, Mem ji bi mûcîze hatiye dinê û hespê wî Bozê Rewan sewaleki efsaneyî yê deryayê ye. Nêzîkahiya navbera Odatis (Hudata) û Zin, Homartes û Mîr Ezin, Paytûngerê Zariadres û Beglî ji balkêş e. Kesayetiyen talî yên mîna qralê ecniyan, Beko û Celalî di çiroka me de ji ya yewanî bêhtir in.

Di tekstê Chares de çend tişt bala mirov dikişînin: Wisa xuya ye ku His-taspes Vistshpa ye. Zariadres û Zarivari (Zarer), li gorî dîroka İraniyan, her du kurê Lohrasp in. (Christensen, rûpel 137).

Ev jî nîşan dide ku çirok bi eslê xwe İrani ye. Yanê Lohrasp û her du kurê xwe ne li Medya lê li rojhilatê İranî hu-kim kirine. Ev çirok jî ber bi rojava ve belav bûye.

Çiroka bi gelemperi di nav hemû gelên Asyayê yên berê de belav bûbû û bêşik ji nav İraniyan derketibû. Li cem kurdan di nav demê de, vê destanê bi temamî rengekî din standîye, Zariadres bûye padışahê Mexrebiyan. Der barê bingeha navê Memê Alan de jî çend şîrove hene. Navê Alan piştî Mem û Zin a Ehmedê Xanî ketiye devê dengbêjan. Her wekî bayê Memê berdevkê mîrê Botan bû û di şeran de ala wî hildigirt; ev leqeblî li Mem tê kirin. Di wextekî de ji bakurê Kafkasyayê ta Çemê Tûnayê



Ehmedê Xanî

di destê miletê ALEN de bûye. Dîrokni-vîsîn Rojhîlat, alen kirine alan. Di serdemâ Sasaniyan de, Alenan nîvröyê (başûrê) Kafkasyayê vegirtine, gihane Çiyayê Zagros, heyâ bi Silêmaniye. Ermeniyan bîranîna vê bûyerê di çiroka evîna Ardeşêş û dotmîra alenan de he-ta iro parastine.

Eger çiroka Memê Alan bingeha xwe ji ya Zariadres standibe, diyar e ku ji eslîn xwe pir dûr ketiye. Li derdore-ke nû, ji neçarı gelek guherîn tê de çê-bûne, bûye kurd û dû re jî misilman. Çirok li bajarê Mexribê ku bajarekî wisa tune, dest pê dike, dû re jî bi gira-nî Cizîrê, bajarê ku Mîr Ezdin li ser hu-kim dike, ji xwe re dike mekan. Wekî din, xusûsiyeten şexsiyeten çirokê, ji nevîna ku di nav de dijin, reaksiyon, adet û gelek taybetiyen wan ên pêwendiyen civakî, ne mimkûn e ku di derdore-ke wiha nû û cihêreg de wekî xwe mabin. Di gelek cihêن çirokê de rûniştimanê bajarê Cizîrê, wekî mirovîn cirnexwes hatine vegotin. Di çirokê de Cizîr wekî kesen çavbirçî, fesad û tirsonek hatine nasîn. Ji ber vê yekê, B. Nikitin dibêje ku ev çirok ji hêla derdore-ke ku ji Cizîriyan ne xwes bûye, hatiye afirandin. Divê neyê jîbirkirin ku, li gorî kevneşopiyekê, ku di Şerefnameyê de tê vegotin, avakarê Xanedana Azîziyan êzîdi bûn û ji mezhebeke bi temamî cihe bûn. Feqet mirov dikare şîroveyeke din jî bike.

Eşîretînî kurdan, bi gişî wekî du êlén mezin ji hev tên vejetandin: Milî û Zilî (an jî Silîvi). Yanê êlén Botan û

Silivî. Dibe ku Memê Alan di destpêkê de Silivî bû? Hêja ye ku ev pirs bê kîrin, lê belê mixabin ne mimkûn e bersi-va wê bê dayîn, ji ber ku iro êdî em ma-neya van her du peyvan (Mil û Zil) ni-zanîn. Ew ji aliyê etnîk, siyasi û civakî ve, ji maneyen xwe yên berê pir bi dûr ketine. Wisa xuya ye ku bi taybeti di bin tesîra Xanî de Memê Alan hatiye misilmankirin. Memê Xanî jiyanâ xwe wekî kesekî pîroz diqedîne. Ew ji hemû tiştîn dînyewî dûr e û dibe pakrewanê evîneke ilahî. Di guhertoya gelêrî de le-hengê me bi bêbextî tê kuştin, yanê di mirina wî de tiştîkî alelade tune, ne di jiyan, ne jî serpêhatiyen wî de tu taybetiyen pîroz û payebilind xuya nakin. Tevî vê yekê, hin guhertoyen mîna ya Mîşo di bin tesîra Ehmedê Xanî de mane: Ramana Mem di zîndanê de, serîdanîna wî li hemberî mirinê di van guhertojan de pir dişibe tevdana Mem a di Mem û Zina Xanî de. Helbet, li vir pê-listineke dengbêjan a ji bo şîrîn nîşandana lehengekî ne pir şîrîn, tê dîtin. Di encamê de li hemberî çirokê qralê ecniyan ku pûtperest e, tê veguhertin û wekî Xizir, pêxemberekî misilman dirûf distîne. Tenê, her sê keçen vî şexsê serdest ê xeyali, wekî xwe dimînîn.

Temaya Memê Alan pariyek hatiye nûjenkirin. Qralê kurdan Mem her wiha xwarziyê qureşîyan e jî. Ma dibû ku, Memê Alan, mîrekî ew çend bi na-vûdeng negîne nîşada qureşîyan. Jix-we wekî ku di Şerefnameyê de jî tê ve-gotin, mideteke dirêj, li Kurdistanê hemû malmezinan, axa, şêx û began xwe

dighandin malbata cenabê pêxember. Veguherîneke din a balkêş jî ya dirûvê Beglî ye. Di guhertoyen nûjen de ev fi-gur hêdî hêdî ji holê radibe. Di çiroka Chares de, paytûngerê ku Zariadres pê re derdikeve rîwingiyê, hevalbendekî najêger ê lehengê her çiroka dema antîk e. Di guhertoya O. Mann de, Beglî heta Cizîrê jî Mem dişopîne, lê belê te-vî nav serpêhatiyen efendiyê xwe nabe. Li cem Mîşo, ev xulamê sadiq li bajarê Mexribê dimîne, tenê di dawiya çirokê de ji bo tolhildana mîrê xwe, derdikeve holê. Eger ev şexs di şuna paytûngerê çirokê antîkîteyê de hatibe bikaranîn, hebûna yekî wisa bêsebeb dimîne, ji ber ku Mem li ser hespê xwe rîwîtiyê dike.

Du armancê Ehmedê Xanî hebûn wextê dest bi nîvîsandina Mem û Zin kir. Wekî ku ew jî di rezê destanê de tîne ziman (rûpel 15... 17), nîvîsandina berhemeke kurdi ku bibûya destpêka wêjeyeke nû û şiyarkirina zanîna hiszâ-nîna neteweyî li cem nîjada xwe. Ya din jî pêkanîna evîneke ilahî. Di dest-pêka destanê de Xanî wiha dibêje:

Ev mîve eger ne abdar e/ Kurmancî ye ew qeder li kair e.

Li dawiyê jî Xanî van rezan tîne zi-man:

Liken, wê xerez li guft û gûy/ Meq-sûd ji hindê cust û cûy,

Zahir kirina cemalî eşq e/ Sabit kır-na kemalî eşq e,

Mem û Zin a Ehmedê Xanî li gorî sewiya zanayan e û hewayeke dîndarî tê de heye; li ser hîmê çeşna destanro-manen camiyê hatiye avakirin. Ji ber vê yekê, ji Memê Alan a gelêrî pir dûr ketiye. Vegetina Xanî gav bi gav ji tema-yâ rasteqîn a efsaneyê dûr dikeve. Di vê rewşê de bêguman karakterên gelek şexsiyetan jî di Mem û Zin a Xanî de, bi temamî guherîne.

Mem lehengekî zêde ne şîrîn e, wekî ku berê jî me anîbû ziman, Mîşo di nav hewldanê de ye da ku wî şîrîn bike: Ew, wî ji nav agirê ku Sî pêxistiye, di-de xelaskirin. Qesra Hesîn ji nû ve ava dike. Di encamê de jî mirineke pîroz dişiyeyê wî dike. Di rastiyê de, Mem peyayekî xwedîn, que, qeba bi kurtî tam tipekî feodal e. Erê, evîna wî tesî-reke mezin lê dike û hiş di serê wî de nahêle, lê belê, tevî ku ev dizane Zin dergisiya Çeko ye, hîç rûyê wî naşîse û bêdudîlî alikariya Celaliyan qebûl dike.

Gava diçin serê eceman, bi fen û fû-tan, xwe ji hevalên xwe vedişêre û ve-digere cem bajarê Cizîrê, cem Zin. Mem bi tena serê xwe nikare tu tiştî bi-ke, her tim ji dostaniya Hesîn istsfade dike. Ew cesareta wî tune ji bo ku bi te-na serê xwe singê xwe bide ber dijwariyîn jiyanê. Li hemberî kesen kêmî xwe, pir cirnexwes û dijwar e û bêdudîlî dike dilê hezkiriyen xwe jî bişikê-ne. Dil dixwest ku ew xwedî dilekî te-nikir bûya.

Heç Memê Xanî, bêrevajîyê Memê çiroka Memê Alan a gelêrî, xwedî gi-yaneke pir bilind û di jiyanâ xwe de jî pir comerd û cîrxwes e. Evîna ku di dilê wî de ye û wî dilivîne, bi temamî xe-

yâlî ye: Evîna wî evîneke saf û ji xisû metê dûr e. Mem bi ser Zînê ve naçê, evîna wî ya ji bo Zînê bi ya Xwedê re dibe yek. Di zîndanê de Mem digihe sewiya herî bilind a tesawûfê. Dema di zîndanê de evîna wî pêşniyaza azadiyê lê dike, xwe nade ber û bi telafuzkirina gotinê tesawûfî dimire. Di her du guhertoyan de ji, yanê hem di Memê Alan a gelêri û hem di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de karakterê Zîne eyîn ne. Ev prensesa muhefezekar di herduran de ji wekî evîndareke şermoke, oldar û şîrîn tê pêşkêşkirin. Di berhema Xanî de Zîn Beko efû dike wekî ku bêyî wî ne ew bi xwe ne ji Zîn wê nikaribin herin bîhus-tê.

Di çiroka Mişo de Zîn nahêle ku Hesen ji bo tolhildana Qralê Kurdan Mîr Ezîn bikuje. Ji xeyîn Mîr Ezîn ku di hemû guhertoyan de hem zâlim, bixwene-bawer û xerab e, hem ji di destê Beko de wekî pêlistokek e, kesayetiyê din ên çirokê di guhertoya gelêri de ji yê di berhema Xanî de zehftir xemilandî ne û tarîfa wan baştır hatiye kirin. Tac-dînê Mem û Zîn hem cihê Hesen û Begliyê Memê Alan digire, wekî ku ew mîna destbirakê Mem tê pêşkêşkirin. Feqet Tacdin zilamekî di halê xwe de û pir bêdeng e. Dema destbirayê wî, Mem tê girtin û diavêjin zîndanê, ne-wêre xwe tev bide. Saeta ku bîryar dis-tîne Mem xelas bike, beriya ku serî li darê zorê bide, daxwaza efûya wî dike. Berevajîyê wî, Hesen û birayê xwe bi comerdi, mîranî û mîvanperweriya xwe xwedî rûcikêñ gelek hêja û cihê-reng in.

Hesen mîna nişana rûmetê ye, li hemberî mîvanen xwe nerm û milahîm, li hemberî kî dibe bila bibe, mîrî sozê xwe ye. Gava ku dibîne Çeko ji sozê xwe vedigere, bêdudili wî bi kuştinê tehdît dike û ji bo rizgarkirina Mem, diyar dike ku bi malê xwe û ca-nê xwe û kurê xwe amade ye. Çeko ji

**Du armancê Ehmedê Xanî hebûn wextê dest bi nivîsandina
Mem û Zîn kir. Wekî ku ew jî di rîzên destanê de tîne ziman
(rûpel 15... 17), nivîsندina berhemekê kurdi ku bibûya destpê-ka wêjeyeke nû û şiyarkirinazanîna hişzanîna neteweyî li cem
nijada xwe. Ya din jî pêkanîna evîneke îlahî. Di destpêka
destanê de Xanî wiha dibêje:**

Ev mîve eger ne abdar e/ Kurmancî ye ew qeder li kar e.

mîr û mîrxas e, bi qasî Hesen ji ber kêmzanebûnê, bi wezifeyê xwe ve ne girêdayî ye, lê belê, mirovekî pir xwe-zahî ye. Dema dibihîze ku Mem dil berdaye dergistiya wî, xwe nagire û li hemberî vê rewşê, serî radike. Bi hêvî û daxwazêñ dûr û dirêj, xwe ji naîbera wan vedikişine, lê dema sozê xweveki-şînî ji dide, ta dawiyê li ser sozê xwe disekine. Heçî Qeretacdîn, birayê biçûk bi dil û can, girêdayê kekê xwe ye. Bi işaretekê çavê birayê xwe yê mezîn, şû-rê xwe ji Çeko re dikişine.

Stî bi xwe, ku di efsaneyê de jineke mîrane ye, li cem Ehmedê Xanî wekî keseke ji rîzê ye. Ew kevaniya maleke mezîn e, di nebûna malxweyê malê de, hemû bîryarêñ gîring ji aliyê wê ve tê standin. Dema dor tê piştgiriya ji bo Mem, ew xwe dike merşik li ber daxwazêñ Hesen. Héta ew gazinan ji celâ-liyan dike, bi idiaya ku wezîfeya xwe li hemberî Mem baş naynîn cih.

Bekoyê Xanî ji ji yê çiroka dengbê-jan cudareng e. Bi pênişa Ehmedê Xanî, Beko bi tevgerên xwe, bi dîndarî û bawerî, armancê Xwedê tîne cih. Xwedê ew hilbijartîye ji bo ku bibe se-bebê windakirina her du dildaran li vê dînyayê û rîzgarbûna wan li axiretê. Li dînyaya din, ew ji nayê cezakirin, bere-vajî ew bi çûna bîhuşte tê xelatkirin. Bekoyê Şeytan, dibe Bekoyê bîhuşti. Ehmedê Xanî felsefeya xwe ya tesawûfi di dîwana xwe de bi laş û gewde dike. Ew tesawûfa ku Şeytan ne wek par-riyekî saqit, lê wek tevkarekî Xwedê û yekîtiperestê wî yê yekane nişan dike.

Bi destê Şeytan, Xwedê mirovan ji rî derdixîne, wan diêşîne, pîs û nîzîm dike, da ku pasî wan bigihîne xwesi, delalî, azadî û bilindahîye. Di dawîya Mem û Zînê de em Beko li bîhuşte di-bînin. Aliyê wî yê xerab ê ku li hemberî Mem û Zîn ku ta ew şandin goristanê ji bi kar dianî, edî nemaye.

Mem û Zîna Xanî û Memê Alan ne tenê ji aliyê naverokê ve, lê her wiha wek uslûb û dirûv ji ji hev û din tîra xwe dûr ketine. Berhema Xanî klasik e, yanê di bin tesîra farisî de ye. Nivîskar-forma helbesta erek û ecem bi kar anîye û piraniya muqayeseyen di destanê de ji helbestvanen mîna Nîzamî û Camî deyn kirine. Ew berhema xwe car caran bi imajîn rewan ên dengbêjan, carinan ji bi metaforêñ eceman dixemilîne:

*Sîmîn beden û semen hezaran
Sîv in degen û memik hezaran*

Hem peyv hem ji şîweya helbesta Xanî gelek dişibin irânîzmî. Xanî pey-vîn farisî û peyvîn erekî yênu ku irânîze bûnê, li nav destana xwe reşandîne. Bi awayekî wisa zêde peyvîn farisî bi kar anîne ku carinan gotinê kurdî xera ki-rine û kirine dirûvîn gotinê farisî: Xwîn kiriye xûn, şev kiriye şeb, zîvîn bûye simîn û hwd.

Tîştekî wisa di tu guhertoyen Memê Alan de ne mimkûn e bê dîtin. Teoriya ku ji hêla Socin ve hatiye derpêşkirin çewt e, qet nebe der barê helbesta kurd a gelêri de. Di stranê dîlanê de rîzên helbestê bikafiye ne. Ew ne li gori kurt-bûn an ji dirêjbûnê, lê belê li gori hejmara kîteyan têz sazkarin. Di stranê

ser û destanê çirokî de rîz edî nayen dîtin, bi piranî rîzên bikafiye ku dirêjbûna wan guhêrbar e, têz dîtin. Dirêjbûna wan li gori bêhna dengbêj diguhe-re. Jixwe, evê dawî dema hin gotinê helbeste ji bir dikirin, an ji ji strandinê diwestiyan, xwedî wê serbestiyê bûn ku hin epîsotên helbeste wekî pexşan vebejîn. Wekî din, rîtm û nuansên awazîn (hewayen) nakaratêñ govendê û stranê ser li gori her rîz mimkûn e biguherin. Heçî efsaneyen epîk ji strandinê bêhtir bi şîweyekî zû û yeknesak tê vegotin. Şîweya ku di Memê Alan de hatiye bikaranîn ji yê destanê kurdî yênen gelêri zêde cuda ye. Awaza di Memê Alan de bi giştî li ser van notayan ava bûye: Sol, sol, sol...la, sol.

Kafiye, bi giştî wekî '...ane' diqedin, esas bi ser ve zêdekirina 'e' yekê 'an'a dawîya hin peyvîn pirhejmar, lêker û gotinê din, bi piranî 'ane' tê pêkanîn. Eger pêwist be, ji bo zimanekî poetik peyvîn yekhejmar wekî ku pirhejmar bin, têz bikaranîn û hwd. Li hin cihê destanê, ji bo xemilandina tîradan, em rastî kafiyeyen ku zêde nayen bikaranîn têz. Lîsta kafiyeyan li jêr hatiye dayîn. Li gori berhevoka ku ji guhertoyen Sebrî û Mişo hatiye amadekirin, ev tabloya kafiyeyan derdikeve holê. Heçî epîzota qismî sêtrîncê, xwedî formeke zêde nelîhevîti ye û gelek xerab hatiye nivîsandin.

...ali: rîzên 1813..16, ...ame: rîzên 1988..92, ...at: rîzên 3390..93, ...aye: rîz-ên 2227..30, ...ene: rîzên 2151..53, ...emo: rîzên 810..12, ...era: rîzên 2282..84, ...ere: rîzên 2098..91, ...êre: rîzên 2112..14, 3383..89, ...eye: rîzên 1834..36, ...iya: rîz-ên 2085..88, ...îne: rîzên 848..51, 889..94, 1581..88, 1888..93, ...înim: rîzên 898..901, 1480..84, 1498..1506, 1521..28, 1545..53, 1564..74, 1602..1606, 1862..63, 1874..77, 1894..99, 1928..31, 1941..55, 2239..47, ...înîn: rîzên 542..56, 844..47, 983..87, 1719..21, 2134..50, 2173..88, 3446..52, ...oro: rîzên 1885..7.

Şowalyeyen zigurd

MEDENÎ FERHO



Sakula dîrokê careke din ji cihê xwe liviye, carekê bi çepê de çû, cara din bi rastê de... Gelê kurd pişta xwe da çarêzen bilind, pala xwe da sîn û berzehêñ neqam. Nişan dan ku êdi kurd ne ew mirov in ku di kokel û kolikên warê kavilan de wekî Robenson bijîn. Zîc, tujik, qaredar, doqik û misas û hesinêñ tê zingarî ji qul û qewrêñ xeşîmîn kevnare yêñ têv evnikî derxistin û dengê xwe bilind kirin. Hawar û banga xîretê bi hezaran mirov kirin rîz. Tenê bûn... Nezan bûn... Rêzanê wan tune bûn. Piştgir û alîkar ne li meydanê bûn. Li ber xwe dan!.. Ketin, riya xwe wînda kirin... Şelişin!.. Her ketin û şasî bû dersek ji wan re... Pirtûk nebûn... Bîranîn qedirşînasan ji nebûn. Ên ku nebûn ji ne berdest bûn. Qedexe bûn. Dîrokeke devkî, di stran û çirok û çîvanokan de nebûn. Nexşeyen cih nebûn. Her tişt di nava restariyeke malkambax de wînda bû. Her çiqasî 'Su û zan' nebûn ji, hêvî ne wînda bû...

Helbet cihê ku hêvî lê hebe ew der war

el.. Li wî warê têrhêvî her dem şûrê xîretê di ser fêza şûrê olê de bûye:

Hêvî ci bû? Ew tîfika ku bi hezar salan mabû di binê xwîliyê de, perengên xwe parastibûn. Çîrîska agir di nava pûşî û pûşxâsalê ku di nava dara kerendolê de bigîhe, têhnik da û pêket. Zu guri bû, ges bû...

Bi vê guri û geşbûnê re, bêdengîyeke mezin derkete meydanê. Ev bêdengî di nava kesen ku dibîjine xwe reşenbir de çêbû.. Daxwaz û doza wan kesan ev encam bû. Lê berî destpêkê, kar û barê wan li kuç û enîşkên heywanan, galegal û quretiyêñ mezin der barê berxwedanê de bûn. Hingî kî çiqasî kelme-mân û gotinêñ kelevaji digitin, ew qasî zana û pêşverû dihate xuyakirin. Ne bes di nava kesen entel de ev reşeb hebû. Di nava kesen şoresger de ji ev temtela pîrnîgar hebû. Vêca, di nava gel de wilo vekirî, bêşermî navek dihate gotin: Şowalyeyen Zigurd... Ev nav, ê kesen ku kelmeman û gotinêñ kelevaji û bêkar, hewceyî pereyê çayekî bûn, dihate gotin. Dijmin ji di bin lêvan re dibesîş... Li hesabî wî dihate. Dijmin her û hér ev politika ku mirovîn şoresger û gel bîne hemberî hev û din û çiqasî zana û dûrbîn bin ji, kesen xwedî doz û daxwaz bêsilûk bike, dimeşand. Her dem di vî warî de ji gîhaye armanca xwe. Heya iro ji, dîroka tarî, bextreş ku di nava kinc û qapalîn rîzi, têriqa de hatiye pêçan û bêxwedî maye, vê reşeb didomîne. Piştî piştana çiyan û paldana sin û berzehan ku deng û awaz bilind bûn û li her çar enîşkên

cîhanê belav bû, bêdengî xera bû. Dehbeyen mîrga Selekuñû ji derketin meydanê... Çend sal wiyo borîn, kar û bar kete nava tevgereke rast û têr berdêl... Xweza di tevger û guhertina xwe de ji, têkçûneke bi berdêlî dide, heyâ ku li ser gura xwe dimîne. Tevger û guhertin bêxwîn û berdêl çênebûye, heyâ li cem kur-dan çêbibe. Helbet dijmin ji pir xedar û bêol e, bêbext e. Dîrokê ev encama dijmin, bi pir mînakên mezin nîşan daye.

Ku iro mirovîn şêst salî, bi şêst fişekî têne kuştin... Bêsûc, bêheq!..

Şowalyeyen doh, xwedî daxwaz û doz, gelo iro ci hatiye guhertin?

Kes ji we li vê bersivê nagere? An ew goti-na gel ku berî niha kiribû nav, hê ji nasname ye? Her destpêkê bi axîn û wawaylêya jinan dest pê kiriye. Dema Nowgorodî li qayîk û kelekîn xwe siwar bûn û ber bi cemseran darûbêrên xwe hejandin, xweş dizanibûn berdêl heye. Lê welatê belengaziyê ew pêwistî hinek gavan kirin. Heya dawî di nava belengazî û bêxiretiyê de jiyan ne li gori wan bû. Ji bo jiyanek xweş û azad çerm û kurkîn hêla Bakur, di nava sinsilan de hebûn. Lewre ji berê xwe dane wir û zanibûn çûn heye, veger tune ye. Gelo ev maf ji bo gelê kurd nîn e? Heya kengê di nava bêzâr û neçariya keftülefta bindestiyê, jiyanek xêbîret û têrge-marî de wê bijî? Edî bes e û divê ku ew navê şowalyeyen zigurdji ji ser mirovîn ku xwe aqilmend dibînin, rabe. Ne zor e, li xwe û li rastiya gelê xwe xwedîderketin bes e.

'Huner rengvedana jiyanê ye'

Her tim hêviyek di dilê min de heye ku bi derbasbûna salan re, ew hêvî hê bilintir dibe; ew jî rizgarbûna çin û neteweya min e. Min peyman daye ku heya ez hebim erkê ku dikeve ser milên min, ez bi başî pêk bînim û çi ji destê min were, ezê bikim û ezê her tim di şin û di govendê de bi çin û neteweya xwe ve bêm girêdan.

Gelo tu kesek hebe li başûr û rojhilatê Kurdistanê ku Necmedîn Xulamî nas neke? N. Xulamî ji 20 salan ve ye ku dest avêtiye hunerê û bi dengê xwe yê xweş û zelal gerdûnê dihejîne. Lê belê ji sala 1980'yan û pê ve Xulamî hat naskirin û di nav gel de deng veda.

Destpêka sala 1980'yan ji bo sê parçeyen mezin ên Kurdistanê destpêka pêvajoyeke nû bû. Xulamî bi xwe ji rojhilatê Kurdistanê ye û wê demê ji şoreşa gelên Iranê gihabû armanca xwe û piraniya axa Rojhilat di destê gelê kurd bi xwe de bû. Wê çaxê hê Xulamî nû dest avêtibû huner û çekê bi hev re û atmosfera azad a li Kurdistanê bandoreke mezin li ser wî çêkir.

Her wiha di heman sal de li başûrê Kurdistanê ji liberxwedana li hemberî Baasa faşist her diçû, lez digirt, dengê Xulamî sînorê çêkirî derbas kir û xwe gihand çemberên pêşmerge û kesen ku li hemberî dijmin li ber xwe didan. Sirûdê Xulamî (Ey pêşmergey qareman, Ey şehîdan, Mamostay dê, û...) moral bilind dikirin û agirê şoreşe geşir dikirin.

Dengê Xulamî hemise û her tim di nav tûrkî pêşmerge de li kéléka pîvaz û nanê ziwa û pirtûkan de cih digire, heya bi niha ji sirûdê Xulamî li ser devê wan kesan e ku di zîndanan de li hemberî hêzên dagirkerên Kurdistanê li ber xwe didin. Bi wî awayî şirovekar dikare bibêje ku Xulamî li başûr û rojhilatê Kurdistanê di pêsiya rêza sirûd-bejan de cih digire.

Wekî me got, sala 1980'yî ji bo bakurê Kurdistanê ji, saleke cihê bû. di wê salê de, cuntaya faşist dest avêtibû qirkirina gelê me li wî parçeyî, ew qirkirin bi birêvebirina şerê taybet heya iro ji didome. Di wê çaxê de rewş ne alîkar bû ji bo ku Xulamî dengê xwe bigihine parçeyê mezin, lê belê iro Xulamî bi rêka TV-MED'ê li her derê Kurdistanê bû mîvan û bi sirûdê agirînen xwe çeperên dijmin dişewitîne.

Ev hevpeyvîna hanê beriya ku weşana MED - TV'yê be rawestandin digel wî hatiye kirin.

Aya hûn dikarin heke bi kurtasî be ji, xwe bi xwendevanê me bidin naskirin?

● Navê min, Necmedîn Xulamî ye,

yên ku hez ji min dikin, Necme ji min re dibêjin. Di 21'ê adara 1958'an de, digel pizota agirê Newrozê, di nava malbateke karker de, li bajarê Sineyê di hembêza bi gul xemilandî ya Çiyayê Awyerê de, min çavên xwe ji jiyanê re ve kirin.

We kengê dest bi gotina stranan kir?

● Ez hêj zarok bûm dema ku evîna hunerê hat û ber derî li min girt, ji ber ku ci bavê min û ci apê min jî, dengê wan herduyan pir xweş bû, vê yekê jî bandoreke mezin li ser min çêkir, an jî vekirîtir bibêjim, hêj temenê min 4-5 sal bû ku min di nav dest û derdora xwe de dest bi gotina stranan kir.

Gelo li ba Xulamî huner ji bo hunerê re ye, an ji bo gel e?

● Di rastiya xwe de huner neynik e ku hemû warêni jiyana gel tê de reng vedide, lewre hunermend bi giştî û ez bi taybeti nikarim ji gelê xwe cuda bibim.

Wekî tê zanîn bi gotina stranê ji bo sıruş û xwezayî û evînê ez ketim meydana hunerê, lê belê her tim hêviyek di dilê min de heye ku bi derbasbûna salan re, ew hêvî hê bilintir dibe, ku ew jî rizgarbûna çin û neteweya min e.


Min peyman daye ku heya ez hebim erkê ku dikeve ser milên min, ez bi başî pêk bînim û çi ji destê min were, ezê bikim û ezê hemise û her tim di şin û di govendê de bi çin û neteweya xwe ve bêm girêdan.

Hûn stran û sirûdê xwe çawa diafîrinin? Aya kesen din alîkariya we dikin?

● Der barê ew a ku çawa stranê min ji diya xwe dibin de, ez dikarim bibêjim ku, dema ez dest bi xwendina helbestekê dikim, heke ew helbest min bihejîne (biherikine), wê çaxê ez awazê jê re çedikim. Hêjayî gotinê ye ji ku tev stran û sirûdê min, min bi xwe müzika wan çêkiriye.

Lê belê pêwist dibînim ku, bibêjim di warê gera li pey helbesten baş de kelem derdi Kevin pêsiya min, lewre neçar dibim pir caran ez bi xwe helbesta stran û sirûdê xwe binivîsim. Ji bo mînak, helbesten sisê ji stranê ku di kaseta min a dawî de derketine, min bi xwe nivísandine û muzik ji min afirandîye.

Vêca bi ya min tiştekî pir xweş e ku hunermend ji xwe re helbestan binivise



Necmedîn Xulamî

û müzikê ji jê re çêke.

Wekî tê zanîn hûn huner û siyasetê bi hev ve girê didin û ji hev qut na-kin. Mebesta we ci ye?

● Ne bi tenê li ba me, lê belê li her dereke vê cihanê, huner û siyaset ji hev nayen qutkirin, ji ber ku huner rengvedana jiyana gel e, gel ji bi şoreşe radi-be, dikeve û ji nû ve radibe.

Berî ku tîrêja tava şoreşa gelên Iranê ji aso derkeve, min dest bi çêkirina sirûdê şoreşerî kir. Ne bi gotina min, lê belê li gorî gotina bi milyonan kesi û aligirê hunerê, ez di warê afirandina sirûdê şoreşerî de bi ser ketime. Bi dehan sirûd min çêkirine ku bandoreke mezin li ser şoreşa gelê kurd li başûr û rojhilatê Kurdistanê çêkiriye.

Her wiha ji bo deh salan rasterast di nav refen Komele de, min xebatên hunerî û pêşmergesi bi hev re bi rê ve di birin.

Vêca hêviya rizgarbûna çin û neteweya min di dilê min de her ku diçe geşir û mezintir dibe, her dera ku ev tîrêja ronahiyê jê derdi Kevin, ez berê xwe didimê û hê bêhtir tîrêje geşir dikim.

Nîha agirê şoreşe li bakurê Kurdistanê germ e û ez ji dil dibêjim heke vê şo-

resa hanê serî hilnedabûya, gelê me yê li Bakur dibû tirk. Ji ber ku heya niha ji hikûmetêni li pey hev li Tîrkiyeyê siyaseta wêrankirina Kurdistan û tunekirina gelê ji xwe re bingeh digirin. Lê belê bi serhildana şoreşe ya li Bakur, planêni dagirkeran vala derketin û gelê me li hemberî wan li ber xwe da.


Ji bo mînak ez dikarim hebûna TV-MED'ê bînim zîmîn ku yek ji berhemî şoreşe ye û bi serê xwe şoreşek e û cara yekemîn e ku gelekî bindest di têkoşîna xwe de, sîd (feyde) ji teknolojiya bilind digire. Bi ya min TV-MED'ê gaveke pir bi bandor e û di dilê dijminen gelê kurd de tirsekî mezin çêkiriye.

Gotina we ya dawî ji xwendevanê Azadiya Welat re ci ye?

● Gotina min a dawî ew e ku bi dil û bi can bi şoreşa xwe re bin û her tim û di her rewşê de, her tişte xwe ji gelê xwe re qurban bikin.

Heya ji me tê, em ji bo parastina demokrasiyê kar bikin, ji ber ku meşxela demokrasiyê, riya şoreşe ronî dike.

HEVPEYVÎN:
BEKIR BAHÖZ



● 15.8.1984: Partiya Karkerêne Kurdistanê (PKK), II bakurê Kurdistanê dest bi şerê çekdariyê kîr. Gerîlayen Hêza Rizgariya Kurdistanê (HRK) roja 15'ê Gelawêjê girtin ser Dihê û Şemzînanê. Pişti ku şer li Dihê û Şemzînanê dest pê kîr, li her derê Kurdistanê belav bû.

Şerê gerîla bi şehîdbûna fermandarê HRK'ê Mahsum Korkmaz bêhtir xurt bû. Pişti şahadeta Mahsum Korkmaz Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARKG) hate damezirandin.

Tevgera azadîya Kurdistanê di ruhê gelê kurd de bi cih bû, bi sedan xort û keçen kurd ji bo rizgariya Kurdistanê ketin nava refîn artesê.

Pişti pêngava 15'ê Gelawêjê, li Kurdistanê, li Türkiye û Ewrûpayê gele

kurd her sal 15'ê Gelawêjê wekî Cejna Rizgariya Kurdistanê pîroz dike. Ev bûyera hanê wekî guleya yekemîn dil nav rûpelên dîroka gelê kurd de cihê xwe girt.

● 15.8.1992: Dewletê bi hezaran leşker û polisên xwe nehişt ku gelê Şîrnexê 15'ê Gelawêjê pîroz bike. Di vê bûyera de gelê Şîrnexê li ber xwe da û di navbera wan û hêzên dewletê de şer çêbû. Şîrnex bû wekî bajareki şer.

● 16.8.1950: Konseya Aşîlyê ya Dînyayê hate avakîrlîn.

AWIR

Aysel winda kirin, lê cihê wê vala nema

Aysel roja 7'ê gelawêja 1993'an li Kadırgayê nêzîkî navenda rojnameyê hate revandin. Kesekî ku revandina Ayselê dîtiye derkete holê. Li gorî agahiyê wî kesî, çend polisên sivil Aysel bi zorê xistine erebeyeke sivil û revandine.

Wekî tê zanîn rojnamevaniya kurdî di salêni 1898'an de dest pê kiriye, hem jî bi zimanê kurdî bi tîpên erebî. Ji destpêkê heta roja iro bi taybetî li bakurê Kurdistanê pir buhayêngiran hatine dayîn û hêjî ev kevnesopî didome. Pişti avabûna komara tirk, bi zimanê kurdî xwendin û nivîsandin heta axaftin hate qedege kirin. Ji ber vê yekê pir rewşenbirêng kurd bi zimanê tirkî derd û kulêng kurdan anîne ziman ew jî her carê bûye mebesta dozvekîrîna daghehan û cezakirina rewşenbirêng kurd.

Heta salêni 1991'an ku rojnameyâ hefteyî Yeni Ülke derket, ew rojname derbasî pirtûka rekoran a dînyayê bû (Gunêss) bi vekirina 51 dozî. Pişti wê rojnameyâ rojane Özgür Gündem derket, wê jî re-koreke din şikand, nêzîkî bîst rojnamevan û nûçevanêng wê hatin qetilkirin. Edî ji bili cezakirîne di literatûra rojnamevaniya kurdî de kuştin, binçavkirîne jî cih girt. Pişti revandina Aysel Malkaç içar peyveke nû kete literatûra rojnamevaniya kurdî: Windakirin.

Kê kir, çima kir, ji bo çi kir, jixwe diyar e. Revandina rojnamevanekî û windakirina wê li dewletteke ku navê xwe di her derî de dewleta hiqûqê zikir dike eger ew qas hêsan be tu gotin namîne ku mirov bibêje. Aysel roja 7'ê gelawêjê 1993'an li Kadırgayê nêzîkî navenda rojnameyê hate revandin. Kesekî ku revandina Ayselê dîtiye derkete holê, li gorî agahiyê wî kesî, çend polisên sivil Aysel bi zorê xistine erebeyeke sivil û revandine. Pişti re girtiyekî bi navê Hasan Karataş ji Girfîha Bursayê nameyekî dişine. Di nameya xwe de diyar dike ku dema ew li Stenbolê di bin çav de bûye Aysel jî li ba wî di bin çav de bûye.

Abûqat û xebatkarêng Özgür Gündem serî li Serkomar Süleyman Demirel



li wezareta karê hundîrin û li dozgerê DGM'ê dixin tu bersiv û agahiyê bi dest naxin. Di ser revandina Ayselê re sê sal borî, tu agahî bi dest neket. Li gorî nameya Hasan Karataş Aysel di bin işkenceyeke pir gîran de bûye, dibe ku ew kuştîbin jî.

Aysel di sala 1971'an de li Dêrsimê hatîye dinê, li Dêrsimê dibistana navîn qedandiye. Pişti re li İzmîrê dest bi Zanîngeha Dokuz Eylül Fakulteya Edebiyatê kiriye, di sala 1993'an de di pola dawîn de dev jê berdaye û hatîye di rojnameyâ Özgür Gündemê de dest bi xebatê kiriye.

Pişti revandina Aysel Malkaç, revandin û windakirinêng ku li Kurdistanê diqewimin içar li Tîrkiyê zêdetir bûn. Hasan Ocak revandin kuştin, paşê cendekî wî li goristana bêxwedîyan hate dîtin. Metin Göktepe û Sayfetin Tepe jî di bin çav de kuştin. Lê kevneşopiya rojnamevaniya kurdî dom dike. Cihê Ayselê, bi dehan Ayselan girt, lê ew tu car ji bir nabe, pênuşa wê li erdê namîne.

M. AGIRÎ

ÇAVDÊRÎ

AMED TİGRİS



Dewlet dixwaze bi kurdî televîzyoneke kontrawarî veke

Dewlet tirk niha di warê pîrsa kurd de ketiye tengasiyeke mezin. Dewlet dixwaze bi destê Serokvezir Necmettin Erbakan çend dek û dolabênu çêke. Bi çend tişîn büyük pîrsa kurd a neteweyî binax bike û veşere. Ji wan listikan yek ji di televîzyonê Tîrkiyêde weşandina programêni bi kurdî ye.

Di van rojan de bi qasî ku di medaya tîrkan de diyar dibe, Serokvezirê Tîrkiyê N. Erbakan sînýalan dide çend wezîr û parlementerên xwe yên kurd ku ji bo rojê pêş di kanala GAP'ê de rojê 1-2 saet amedekariya weşaneke bi kurdî bikin. Ji Partiya Refahê Wezîrê Dewletê Lutfî Esengün û ji Partiya Riya Rast (DYP) ji dîsa Wezîrê Dewletê Selim Ensarioğlu bi vî karî re mijûl dibin.

Gelo dewlet çîma dixwaze di televîzyonê Tîrkiyê de rojê çend saetan bi kurdî weşanê bike? Ma siyaseta dewlet û hikûmetê ya der heqê kurdan de hate guhartin? Na, politikaya dewletê der heqê kurdan de nehatiye guhartin û politikaya kevn her berdewam e. Heger politikaya wan bihatana guhartin, wê demê Tîrkiyê ji bo girtina MED-TV'ye bi trîyonan bertîl nedîdan şîrket û dewletê Ewrûpayê û ji bo girtina MED-TV'ye Serkomar Süleyman Demirel û Serokvezîra berê Tansu Çiller bi xwe heta İspanya û Polonyayê nedîcûn û ji wan lava, gîlî gazin nedikirin.

Dewlet pişti vekirina MED-TV'ye ket tengasiyeke mezin û dijwar. Mezinbûna rola MED-TV'ye bi çavên serê xwe dîtin. Gelek kurd, tirk û gelên din ên ku li Tîrkiyê û li Rojhilata Navîn dîjin û bi politikayê ve mijûl nedibûn û bi rastiya bîzava rizgariya neteweyî nîzanibûn, ew bi riya MED-TV'ye rastî bi çavên serê xwe dîtin. Zanabûn û hisyârbûna wan a neteweyî û demokratik xurt bû. Derew û xapandinê dewleta xwînxwar û kedxwar baştîr dîtin û ji dewletê bi dûr ketin û dikevin.

Dewlet ji ber ku rê li ber vê pêşveçûnê bigire, riya rizgarbûnê di vekirin û weşana televîzyoneke kurdî de dibîne. Ew dixwaze di bin kontrola xwe de rojê çend saetî bi kurdî weşanê bike. Bi zimanê kurdî jî, li dijî kurdan têbikoşe. Bi kurdî jî, înkariya kurd û Kurdistanê bike. Qet nebe çend salêni din jî doza kurd bi paş ve biavîye an jî bide rawestandin. Ji aliye din ve jî, bi çend stran û govandan çavê gel kurd girê bide û bi vê listika hanê gel bixapîne.

Ma xem e, ci ye? Ji vir şûn ve edî gelê kurd. tê xapandin û ji doza xwe bi paş ve gav diavêye? Ev ne gengaz (mimkûn) e. Ev hem ji aliye ideolojîk-politîk û hem ji ji aliye rêtixtinî û çandî ve dûrî aqil e. Gelê kurd iro ji aliye zanabûn û hisyârbûna neteweyî û rêtixtinî ve gihişîye radeyeke (dereceyeke) gelek bilind. Ew edî rê nadî listik û dek û dolabê romiyan. Tu kes û hêz edî nikare wekî zemanen berê wiha bi awayekî hêsanî gelê kurd bixapîne. Erbakan dixwaze dema osmanî bi paş ve bîne. Bi riya dîn careke din gel bixapîne û rê li pêşîya têkoşîna rizgariya neteweyî bigire. Lê ev rê û metodê romê gelek kevn in û ne tiştekî nû ye. Rê û metodê bay û kalen Erbakan Yavuz Sultan Selim, Sultan Abdulhamid û padışahen osmanî yên din in. Li ser navê demokrasi û modernîzmê politikaya Mustafa Kemal a nîjadperest û şoven a 70 salî iflas kir û edî nikarin wê politikayê bidomînin, lê dîsa dixwazin careke din ruhê osmanî bi destê Erbakan û Refahê ji nû ve vejînîn. Wekî ku kurd, osmaniyeñ dagirker û barbar nas nakin an jî, ji bîr kirine. Dîrok zû bi zû ji bîr nabe û nayê veşartin. Kurd ne nezan û din in ku dîroka reş a osmaniyan ji bîr bikin.

Mustafa Kemal leşkerekî Yavuz û Abdulhamid bû. Bi rengêk din politikaya wan a iflaşkîri xwest li ser navê demokrasiyê bidomîne. Her wiha politikaya osmaniyeñ dagirker û nîjadperest li ser navê demokrasiyê bi zor bela 70 salî dikaribûn bidomînin. Divê baş bê zanîn ku politikaya Erbakan ji politikaya kemalîstan ne politikayeke cuda ye. Ya osmaniyan a 600 salan e. Ya bavê Kemalîzmê ye. Bîngeha vê politikayê dagirkirin, talan, wêran, înkârikirin û asimîlasyon e. Madem ku ev ne lîstik e, çima ji bo girtina MED-TV hemû derfetên xwe yên diplomatik û madî û manewî bi kar tînin. Ji aliye din ve ew bi xwe niha dixwazin tv'ya kurdî vekin. Belê politikaya çêlikîn osmaniyan ev e.

Birîn cebar nabe û hêvî namire...



Ew tirk e, kurd e, kiye, ji ku ye? Em nizanın û ne lazıme ji... Lê em dizanın ku kezeba wê girtine, birine, wê û gelegén wekî wê birindar hiştine... Li kezeba xwe digere...

tu... bi lez ji mala xwe derketi û dereng mayî. Deriyê erekbeşa xwe vedikî, beriya ku siwar bibî, teví leza xwe ji, fêm dikî ku erebeya te nizm bâye; tekelê wê ne li şûna xwe ne...

Tu... bi jin û zarokên xwe re rojekê derketi geşte. We ji xwe re dereke bisa tenha hilbijart ku li riya sê saetan insan tune bin... Hün li bin siya kevneçinareke ku li ber aveke sar û spî ye rûniştin. We çaydank tije av kir, danî ser tûpê biçük; beriya ku tûp pêxî, tu cixareyekê ji paketa xwe derdixî, datînî ser lêva xwe û destê xwe dikî berîka êlekê xwe, lê destê xwe vala ji berîka xwe derdixî; hesteyê te ne li şûna xwe ye...

Tu... bi dilekî xweş devê sandoqa xwe vedikî ku cihêzên xwe nîşanî cîra-na xwe bidî, lê sandoq vipîvala ye...

Tu... pîremêrê bawî, tu dixwazî hînekî di honikahiya êvarê de bimesî; so-

**Navê wan di çapemeniya tirk de "Dayikê Şemiyê" ne,
lê ew bi xwe dayik û xizmên windayıyan in, an ji "mirov" in.
Tev kezebşewîfî ne, îcar ev ji têr nekir "Dayîkên Înê" ji
derxistin pêşîya wan, erê dayikên leşkeran.**

RAHMÎ BATUR **bi çavekî ne ji rêzê li mijarê nihêrt.**

la xwe li pê dikî, destê xwe bêşik dirê-ji pişî derî dikî, lê gopalê te ne li şûna xwe ye...

Tu... roja ïnê diçî mizgeftê tevlî xubeyê dibî; pişti nimêjê derdikevî ku sola te ne di nav solan de ye, li şûna xwe nîn e...

Tu... bi zarezar ji dayika xwe ya belengaz hinek pere distinî û baz didi dikânê; benîşt û nokê şekirkirî dixwazî; lê dema ku ji bo pereyê dikandar bidi-yê, destê xwe dixî berîka xwe, sê tili-yê te bi hev re di quleke fireh de diçî-ne xwar...

Tu... ji xew radibî, hewl didî xwe ku diranê xwe bisoyî; lê firçeya te ya di-

ranşûştinê ne li şûna xwe ye...

Tu... (xamîma diltenik) laka wî amâde dikî, bi fikîni jê re dibî, lê finoya te ya biçûk û spî û delal nayê xwe navêje bersinga-te; li şûna xwe nîn e...

Tu... ew.. ez...

Em tev...

Dema em tiştekî xwe winda dikin, ji me ye ku rehek ji dilê me diqete. Na, bi rastî ji diqete!..

Kes nizanê ku kengê dest pê kir... Belkî mehek berê, belkî salek, belkî deh sal, sed sal, hezar, deh hezár sal berê... Belkî hê ku ew roj bi "şemî" yê ne-

hatibû binavkirin û Liseya Galatasarayê çenekiribûn, ew her roja şemiyê, wekî iro, dîsa dihatin li ber Liseya Galatasarayê rûdiştin...

Ü belki wekî iro, hê ji wê demê ve ku ew li ber Liseya Galatasarayê rûdiştin, insanê ku bi çavên bitirs, bi çavên tije pirs û bi dizî li wan mîze dikirin, di ber wan re bêdeng diherikin, diçûn, di dilê xwe de digerandin:

- Ev kî ne, ci dixwazî?
- Neyarê dewletê ne!
- Roja me herimandin!
- Terorist in!
- Na, dayikê terorîstan in!
- Xwedê bela wan bide!
- Ax!..
- Ne ji van polisan bûya...
- Bi Xwedê ezê ji li ba wan rûniştama...
- Demokrasî tune, ez ci bikim?!
- Her bijîn!
- Kezeba wan ji, pola ye...

d

ema em
tiştekî xwe

winda dikan, ji me ye ku
rehek ji dilê me diqite.
Na, bi rastî ji diqete!..
Dîsa ji mirov zû ji bîr dike.
Lê dayikên windabûyan?
Gelo dema zarokên wan
digirin, dibin; ji saza dilê
wan çend têl diqetin?
Ew ji dikarin ji bîr bikin?

- Tirs çi ye, nizanin...
- Ku ev ji nebin...

- Lo'heyran insaneti miriye, kes li
gaziya wan nahisine, piştgiriya wan na-
ke. Ku milet çariya bêxiretiyê ji ser
xwe biavêje, tırsa xwe bişkene, ma...
Ey wax! Dîsa xezeb ji çavên polisan di-
bare! Zû ji vir herim, hê ku teperep der-
neketiye... Mirov dizane ci dibe?.. Ki
dikeve pêsiya wan sebavan, dikutin, di-
bin...

Tu... ew.. ez..
Em tev...

Dema em tiştekî xwe winda dikan, ji
me ye ku rehek ji dilê me diqite. Na, bi
rastî ji diqete!.. Dîsa ji mirov zû ji bîr
dike.

Lê dayikên windabûyan? Gelo dema
zarokên wan digirin, dibin; ji saza dilê
wan çend têl diqetin? Ew ji dikarin ji
bîr bikin?

Piştî darbeya 12'ê rezberê li
Çewlikê (Bingolê) leşker diavêjine ser
mala Hüseyin Morsümbül û wî digirin,
dibin. Ji dayika wî re dibêjin:

"Emê ifadeya kurê te bigirin û biş-
nin."

Lê naşmin. Di ser de ji têb wî
ku nexweş e, ji nav livînan derdixin, di-
bin. Lê dixin, dibêjinê:

"Kurê te reviya! Te, ew li ku veşar-
tiye, bibêje?!"

Heta şes-heft salan, tim diavêjine ser
mala wan:

"Ka kurê we?!"

Ew nikarin, newêrin bibêjin "Ka kur-
ê me, we ci anî serê wî", lê ew têb, kur
ji wan dixwazin... Piştî demekê êdi hew
dikarin idare bikin, bar dikin...

Ji aliye din ve ji, henekên xwe bi



wan dikan Tim bangâ leşkeriyê dikan,
nameya bangê rê dikine mala wan, di-
bêjin bila were, bibe leşker..

Sazdeh sal dibore... Rojekê di çapem-
niyê de dema nûçeyekê li ser dayik-
ên-windabûyan dixwînîn, dayika wî û
xweha wî têb, li ber Liseya Galatasara-
yê rûdinin.

Piştî şazdeh salan, dayika Hüseyin
Morsümbül li bajarê Stenbolê kurê xwe
dixwaze...

car, dayikên windabûyan li ber Liseya
Galatasarayê bûn û dîsa wekî xweliyâ
Xwedê li hawidorêwan polis hebûn.
Lê ev car li kesi nedan, kes negirtin.

Hunermand Ferhat Tunç û Şanar
Yurdatapan ji, ji bo piştgiriya dayikan
hatibûn.

Gazina bayê Hasan Ocak guhê ker
qul dikir:

"Ez do çüm goristana pakrewanan.
Hinekan li ser gora miriyên xwe dua

bû..."

Dayikek rabû ser piyan:

"Bi lêdan û girtinê bi me nekarin.
Îcar gün li hemberî me, bi navê dayikên
înê, dayikên leşkeran derxistin, weki
ku me zarokên wan kuştibin, me zaro-
kên wan revandibin..."

Dixwazin me li dijî hev derxin. Lê
êşa me, birfîna me yek e, em dixwazin.
ku ew ji werin, em bi hev re tékoşînî
bidin... Bo ci ewê zarokên me birevî-
nin, winda bikin, bikujin û di ser de ji
me li dijî hev derxin?"

Wezirê Tenduristîyê Yıldırım Aktuna
di civîna çapemniyê de ji bo dayik-
ên windabûyan û dayikên leşkeran
wiha digot:

"Em dayikên şemiyê û dayikên înê
binin cem hev..."

Cawa ku problem di navbera dayi-
kan de be, tu roleke dewletê tê de tune
be, dibêjin em dayikan binin ba hev.
Yanê dewlet mezinatiya xwe, edaleta
xwe dide nîşan. Hewl dide xwe ku pirs-
girêkên di navbera welatiyên xwe de
çareser bike...

Lewre, dayikên windabûyan in ên
ku leşkeran dikujin û dayikên leşkeran
in ên ku Aysel Malkaç, Hüseyin Mor-
sümbül, Ali Tekdağ, Fehmi Tosun, Ta-
lat Türkoğlu, Beşir Sayın, Nedim Ak-
köyün, Düzgün Tekin, Hasan Ocak,
Rıdvan Karakoç û gelek kesen din gir-
tin, revandin...

Hinek kuştin, termen wan avêtin
derinan û kes nizane ku bi hinekên din
ci kirin...

Yanê kaniya eş û janê vî welati
dayik in...

Ü ku mirov destê xwe daneyne ser
wijdana xwe, tu gunheke dewanetê
tune!

Serê her gunehî dayik in, DAYIK...

Em dayikan bikujin!



Ceribandinê Montaigne

PORTRE / MONTAIGNE

Michel de Montaigne di 1533'an de ji dayik dibe û wî didin pîrikekê da ku wî mezin bike. Di du saliya xwe de bi metodeke nû hînî latînî qibe. Pişti ku dibe heft salî ji li koleja herî baş a Fransayê dest bi perwerdehiyê dike. Di 1546'an de ji (13 salî) li Bordeaux'ye di Fakulteya Edebiyatê de felsefeyê dixwîne. Pişti du salên din ji (1548) li Toulouse'ê diçe dibistana hiqûqê.

Di 1557'an de dikeve Meclîsa Belediyeya Bordeaux'ye. Di 1565'an de bi Françoise de la Chassagne re dizewice. Sala 1582'an, ew dibe Serokê Belediyeya Bordeaux'ye.

Montaigne di 1572'an de dest bi nivîsîna "Les essais" (Ceribandin) dike. Heta 1589'an ji hin tiştan li serê zêde dike û ev kitêb digihîje halê xwe yê herî xurt û birêkûpêk. Michel de Montaigne di 1592'an de wefat dike.



Mîna Pascal ji gotiye; her tiştên di "Les essais" (Ceribandin) de, mirov ne di Montaigne de, di xwe de dibîne. Heta mirov hinekî din ji zêdetir here, dikare mîna Béranger bibêje: "Montaigne ji, çiqas ji fîkrê min dizîne!"

Girîngiya Montaigne ew e ku ji 400 sal berî vêga pirtûka xwe ya bi navê "Les essais" (Ceribandin) nivisiye, lê iro ji, ji bo xwendeyanan pirtûkeke jénager e. Her nivîsa ku tê de ye mirov dikare her tim bixwîne û jê tameke din bistîne. Mîna Pascal ji gotiye; her tiştên di "Les essais" (Ceribandin) de, mirov ne di Montaigne de, di xwe de dibîne. Heta mirov hinekî din ji zêdetir here, dikare mîna Béranger bibêje: "Montaigne ji, çiqas ji fîkrê min dizîne!"

Ji bér girîngiya Montaigne û pirtûka wî "Les essais" (Ceribandin), ev nivîs a "Li ser zimê" ji vê pirtûkê hatîye standin. Her çiqas Montaigne ev nivîs li ser zimanê xwe fransîzî nivîsandibe ji, wê were dîtin ku tiştên tê de çiqas baş rewşa iro ya zimanê kurdî tîne zimê.

Divê bê zanîn ku fransîziya berî 400 salan wê zêde neşibe ya iro. Lî Sabahattin Eyüboğlu demeke dûr û dirêj li ser xebat kiriye û bi zimanê pak ew wergerandiye zimanê tirkî. Ev wergera kurdî ji, ji wergera Eyüboğlu pêk hat.

LI SER ZIMAN

Mirovîn hunermend û fikirmend, bi gotin û nivîsên xwe, nirxekê didine zimê. Vî karî ji, bi riya tewandina ziman, zêdekirina imkan û bi xurtkirina zimê dîkin; ne ku tiştên nû dixin nav zimê. Peyvîn nû naxin navê. Wan dewlemend dîkin, mane û bikaranîna wan xurt dîkin;

kûrahiyê didin; tameke nedîti didin wan; lê belê li ser vê yekê gelekî baş difikirin û karê xwe bi pisporî dîkin.

Mirov li nivîskarêne vê demê dînihêre, dibîne ku tev ne ehlî vî karî ne. Mîna her kesî axaftinê biçûk dibînin û dest diavêjin karêne mezîn û bicesaret. Fejet ji ber bêhunerî û bêzewqiyê di nîvê rê de dimînin. Tiştên gelekî ecêb; bêtam û bêmane derdixin holê. Bi vî rengî, ew tiştên ku hêjâyî qadâ bilind in, dixin bin erdê. Li hemberî tişteki nû ji xwe ve diçin. Ne xema wan e ku bi kîrî tişteki tê an na. Ji bo ku peyveke nû bi kar bînin ya kévn diavêjin, gelek caran ji ew peyva ku diavêjin ji ya nû bihêz û zinditir e.

Di zimanê me de imkanê fireh ez dibînim, lê belê me ew kêm bi kar anîye. Bi zimanê ku di nêçir û ser de em bi kar tînin, ma mirov dikare ci neke; gelek peyvan ji wê axaftinê em dikarin bistînin. Biwêjîn di zimanê axaftinê de, mîna giyayan in, çiqas cih diguherin, ew qas ji biber û bihêz dibin.

Zimanê me gelekî dewlemend e lê, zêdetir saxlemî û zindîtiyê dixwaze. Gelek caran têri ramaneke bicoş û herikbar nakek. Dema mirov dest bi xebateke kûr dike, ziman gelekî qels dimîne. Wê çaxê ji, ji mecbûrî mirov serî li latinî û grekî dide. Em hêza peyvîn ku di zimanê gel de ne, bi hêsanî nikarin bîbin. Çunki ev peyv wisa beredayî hatîne bikaranîn ku, ketîne bin piyan û xweşikiya wan bûye ji rîzê. Gelek peyvîn binirx, biwêjîn delal hene ku piştî ku ji aliyê gel ve hatîne bikaranîn, rengê wan jê çûye, delaliya wan nemaye. Lê belê ew kesen ku pozê wan baş bêhnê distîne, ji van biwêjîn tameke xweş distînin; her wiha nirxa wan kesen ku ew peyv cara yekemîn gotine, bi ketîna erdê winda nabe.

AYNUR BOZKURT

MONTAIGNE DENEMELER

TÜRKÇESİ: SABAHATTİN EYUBOĞLU

cem yayinevi





LI NÇM'ya Stenbolê şaxê Beyoğlu yê heftiyê gelek konser, pêşandana filman têr pêşkêşkirin.

- 11.8.1996 **Yekem:** Konsera Grup Munzur, saet: 18.30
- 16.8.1996 **În:** Film: Kaldırımlı Çocukları (Zarokên Peyariyan), rejîsor: Vittorio de Sica, saet: 19.00
- 17.8.1996 **Şemî:** Konsera Koma Gulên Xerzan, saet: 18.30

Vê heftiyê çalakîyên ku LI NÇM'ya Izmirê têr pêşkêşkirin ev in:

- 11.8.1996 **Yekem:** Konsera Koma Dengê Bahoz û pêşangeha wêneyan, saet: 18.00

● 15.8.1996 **Pêngem:** Şanoya Hêvî Listika Koma Kendal "Düan Agirê Zerdeş", Stran dengê Bahoz, şîr û nişandana slayt, saet: 18.00

- 17.8.1996 **Şemî:** Şanoya Hêvî Listika "Hêviya me hûn in"

Li Evrensel Kültûrê JF ev çalakî heri:

- 11.8.1996 **Yekem:** Konsera Koma Agirê Jîyan, saet: 17.00
- 12.8.1996 **Duşem:** Film (Düşler), rejîsor A. Krosova, saet: 19.00
- 14.8.1996 **Çarşem:** Film (Dersu Uzala), rejîsor A. Krosova, saet: 19.00
- 17.8.1996 **Pêngem:** Film (Büyük Diktatör) rejîsor Charlie Chaplin, saet: 15.00

RÜDAN

Bîranîna Hüseyin Deniz



Hüseyin Deniz

ku pismamê hev bûn li ber nedinêrîn. Di nav hev de hel dikirin, kes pê nedihesandin.

Rojekê ji rojan Heso, dara hejîrê ya pismamê xwe Huso ji binî birî û bi di-zî bir mala xwe. Huso pir bi ber dara xwe ya hejîrê ket û çû giliyê Heso li cem mezin û rihsipiyênd gund kir. Rihsipiyâng bangî Heso û Huso kirin û li giliyêwan guhdarî kirin.

Pêşî Huso giliyê xwe gotin:

— Pismamê min Heso, dara min a hejîrê ji binî ve biriye û biriye mala xwe. Ez dozdar im. Ez dixwazim hûn wî ceza bikin û zirara min jê bistînin.

Heso zanibû bipeyive, çawa kir, çilo kir, rihsipî xapandin û dilê wan bi xwe şewitand. Hindik mabû ku pismamê xwe neheq derxista.

Rihsipiyâng biryara xwe dan:

— Heso neheq e, bila careke din tiştekî wisa neke. De rabin herin mala xwe.

Huso ji biryare tiştek fêm nekir, şas ma. Ji xwe re got:

— Hem dibêjin Heso neheq e û hem jî cezayekî nadîn; ev çawa biryare?

Huso biryara rihsipiyâng qebûl nekir-bû, lê li ber derneket, xist dilê xwe ku rojekê heyfa xwe hîfîne.

Rojekê rahişt bivirê xwe û çû nav erdê Heso, heft darêñ wî birîn, anî mala xwe. Heyfa xwe hilanibû.

Heso dît ku heft darêñ wî ji binî ve birîne, fêm kir ku pismamê wî ew kar kiriye; dîn bû, rasterast çû cem rihsipiyâng:

— Huso heft darêñ min birîne, ez dozdar im.

Rihsipiyâng bangî Huso kirin, jê pîrsin, wî got:

— Erê min birîne.

Gotin:

— Çima te birîn, tu nizanî ku ew sûc e?

— Baş e çima Heso dara min a hejîrê birî?

— Ma me hema wê rojê bangî wî nekir û negot tu neheq i?

Huso got:

— Belê we got. Ma bi gotina, tu neheq i tenê dibe? Ev ci biryara çewt e? Hûn çawa ceza didin neheqan? Heke ku biryara we baş e, ji min re jî bibêjin: "Tu neheq i" Hûn dixwazin heft caran ji min re bibêjin "Tu neheq i."

Rihsipiyâng heq dan Huso, rojekê din jî hewedarî, aligirtî nekirin. Li ser heqiyê biryaren xwe dan.

EDLA.DENIZ

TÎSK



LERZAN JANDIL

Rojê merdene ra dime...

Rojê merdene roja 69'î amê xelesnayene. 12 canî. 12 aji ginay waro.. Ez bi xo şehadetê nê 12 canan verde jî, ze şehadetanê bînan êna çok.. Rojê 81', 82', 84', 89', 95'... ez na mesala de wazena hetê propaganda ser ro bivindîr. Wendewanê Azadiya Welaî Goebelsî rind şinasnenê. Goebels Wezîrê Propaganda yê Hiltlerî bî. Kesê ke propagandaya siyaye kenê, tim teba Goebelsî ênê re mordeman û mordematiye vîrî. Propagandaya siyaye şarê normalî kena kor, kena rasîf, şoven, kena cinawir. Berhemê propagandaya siyaye şarê ma ra xerîb nînyê. 74 seri yo ke dewleta Tîrkiye naye kena. La belê na dolime, propaganda siyaye pêde da piro..

Demê nê rojî de propaganda tewr qilêrine; tewr siyaye dewlete û medya daye, nînan ra ji TGRT kerde. Histeriyê alaya tîrkan ra dime, histeriyê dayikanê ênî, histeriyê rojê merdene pêşkare nînan bî. Dest kerd ci, herendiya vengûvajî (xebera) de komentar (şîrove) dayî. Se êno zanayene kongreya HADEV'î ra dime pêlê şovenizm û râsîzmî ebi destê dewlete û nînan, da bi her cayı ro. Eke teng de manenê, vanê: "Ma birayê jûbînî me." Rojâ hîraye jî vanê: "Ya hes bike, ya jî biterikîne."

Direk hetê dewlete de na propaganda zafîri Ş. Kazanî viraşte. Kazanî vatene: "Nê dizdêniya non wenê. Faksê nînan, cîktelefonê (cep telefonu) nînan estê. Nê ebi emir, ebi talîmat rojê merdene cêne." Bêguman Hunermend Halil Ergünî roja 69'î de vengûvajî Star Tv zurê Wêzîr Kazanî kerdî eşkera.

Derba giranê, avukatê kesanê ke ebi tekbir adir verda Madîmak û 35 canî vêşnayî wunciya televîzyon de vano: "Emrî mi ebi însan û însantiye derbaz biyo." Maşala, heq tey bo. Eke keso ke emrî xo ebi însan û însantiye derbaz biyo, niya bikerô, ma ê bînî se bikerê! Eynî Kazan ATV de persa rojnemavanî ser ro, vano:

— Ti hetê kamî de ra?

— Ez hetê kesî de niya, vano rojnamavan.

— E ê, ti ci qese kena?! vano Kazan û vengê rojnamavanî birîno. Ma rojnamavan feqîr hetê kamî de bî, bêguman hetê însan û însantiye de.

Kazan ebi nînan jî nêvîndeno, vano: "Em şo şewa Kandîlî ya. Mi na waştena dawiyê red nêkerde. Mi waşt ke, wa her kes kîf bikerô." Hêni êno famkerdene ke gere 12 canî biginêne waro û şewa Kandîlî waştene guretiya biyamene qebûldene. Eke şewa Kandîlî tayîna dûrî biyêne, se biyêne. E jî şîma bifikirê.

Ma cendîrme û polosê dewlete Sargazi de cendîrmê ebi nîdayanê "Allah, Allah, Allah"î êrîşê şarê ma kerdene. Qey ti vana, hemverê "kafira" şer kenê. Ze Koçgîrî, Zîlanî...

Cendîrmê niya kenê, polosî pêde manenê. Înan kar tayîna avê bêrd "Tekbîr. Allahûhûkber..." Ze zîndanê Amedî.

Eke na welat politîkvanî jû dest de ale, jû dest de Quran welat ra bicîrê, propaganda bikerê, medya dewlete ebi ale û Quran karê xo bidomîno, zaf cî benê û binê nê çiyan de jî nê politîkvanî pêro pelexînê.

Gere nê çiya pêrîne ra derse bêro guretene. Na derse, gere Almananya ra jî bêro guretene. Şerî 2 ra dime Almanya de entnazifizeren (yane cemâti her het ra hetê politîka, dewlete, polos, leşker, aboriye, nazîyan ra pakî/têmîz kerdene) tam niyamê kerdene. Ew ro jî şar belayê daye oncen. Rojê nê rojê, gere welate ma tim qirêj û xirabiyan ra bêro pa kerdene. Şeba naye jî gere her kes tim qirêj û xirabiya mezgê xo ra binivisno ke xo vîra mekero.

Heq û neheq

Heso û Huso pismamê hev bûn. Malen wan û erdê wan nêzîki hev bûn. Gelek caran zîrân didan hev du, lê ji bo

Ezmanê wê navçeyê her dem di bîra min de ye û her dem sayî û şin e. Stêrikên wê bi şeqw in. Sevên wê bitirs û xof in. Kûçikên derdora sînor dûr û dirêj direyin. Dengê stranê zîz, ji koli-kên (quleyên) nobedarê tixûb tê. Cariyan nobedar wilo keseran vedidin, dengê wan heta ber bi malêñ dûrî sînor ji diçe. Di navbera kolikan de, guftûgo-yinen balkês çedibin:

— Kuro Yozgatliyo! Lawo, tu dibêjî nesîb heye em bi ser malbata xwe ve vegerin? Gelo em dê sax salim li der-gistiyen xwe vegerin?

Şev tarî ye. Cemed û seqem e. Çemê Çexçexê wekî marekî bêdeng û çivanok xwe ber bi binxetê berdide. Qırş û qirêjî, silav, eş û janan bi xwe re dibe wî aliyê xetê. Dema ku xelkê Qamişlo-yê çav li çem dikin, mîna ku bêhna mirov û xwediyên xwe bikin, xemgîn û keserkûr dîbin, bi hesret li çem dinêrin. Çem ji xelkê jêrê re wekî qinyatê ye. Bêhna wan pê fireh dibe.

Em, ango zarok, yêni di helbesta Ahmed Arîf de ne: "Hilma me têra mista me nake." Li navçeyê, hew sînemayek heye. Film diqede. Edî wext ji bûye dereng. Dema em ji sînemayê derdi kevin, mûyê me dibe six, lêva me reş dibe û dîlerize. Di binê qezaxê naylonî de em xwe diguvêşin. Ji hundirê sînemaya ku bi hilma mirovan germ bûye, em wekî pisingêñ pernişî, bi hesreta ketina nav nivînan berê xwe didin malê.

Hêviya qaçaxçî "mil" e. "Mil" barek hûremûrê ku ji binxetê derbasî serxetê bibe ye. Hêvi û xewna bûkan, aboriya wan, bi "mil" ve girêdayî ye. Dibe ku guleyeke G-3'ye li pêş çavêñ qaçaxçî, li nîvî eniya wî bikeve, lê dibe ku ew "mil" bigihêje cih...

Serlesker ji hêviya bûkan fêm nake û xizanî nedîtiye. Derxistina heqê nanê zarakan ji ne xema wî ye. Kengê roj hilat, li cîba xwe siwar e. Bihost bi bihost sînor kontrol dike. Ka şop heye an na.

Bayê kur wekî zûrezûra hûtekî birîndar di şevê de dinale. Her çiqas dengê bayê xurt dibe, reyîna kûçikan ji pê rezêde dibe. Dîsa şevek ji yên pir erjeng di ser nobedar re boriye. Bi rojan nobedar di kolikê de ye, bi şev ji di kozikê de. Kozik çaleke sergirtî ye. Du mirov dikarin tê de bihewin. Ji êvarê heta berbangê, nobedar tiliya xwe ji ser tetikê, serê xwe ji kozikê ranekiriye. Gerçî, di tixûbê kijan nobedarî de, qaçaxçiyek were kuştin, destûra çûyina malê jê re heye. Mehek destûrstandin, ji leşkeriya mîna azabê cehnemê re, derman e. "Milê" were bidestxistin ji, tê lihevpar-kirin. Lê bêxwediya tîrsê, tariya şevê û devê tivingê qeremê mirovan dişikîne.

Dema ku serlesker, bibîne ku kûçik li hev civiyabin û zûrezûrê bikin, ew dizane ev berbangeke bixêr û bereket e. Ew dizane ku xwîn li erdê heye. Heke xwîn hebe. "Mil" ji heye. Edî kîf, kîfî wî ye.

Dilê nobedar di çûyina malê de heye. Bêriya mirovên xwe kiriye. Bêriya dergisiya wî, dilê wî dikewîne. Lê şev tarî ye. Bayê kur vinevinê dike. Nobedarî tixûb, dil bitirs e. Dil, bi kutekut e. Qaçaxçî bi hêvi ye. Xîştexîştek hate



Çar mirî. Çar miriyên rût û tazî, li ser betonê dirêjkirî. Çapan, bi ser wan de nixumandibûn. Yê ku dihat hundir, pêşî bi dizîka keviya çapan radikir, li rûyê yê mirî dinêri.

guhê nobedar. Agir bi hinavê wî ket. Çokên wî şikestin. Di vê şeva seqemî de, hezar kilometre dûrî welatê xwe, li welatekî biyan, di nav mirovên ku ji zimanê wan fêm nake de. Pêjna lüleyeke sar li pişt stûyê wî tê. Berê namlüyê da jorê, çavêñ xwe girtin, heta jê hat tetik kişand. Ji kozikên Eznavirê heta bi taxa Kanika, nobedaran wekî ax û xwelîyê gule barandin. Ezman bû weki şeveke Parisê ya bi fişekên hawayî...

Mirovên ku li şevbihîrkê rûniştibûn, ev teqîn şîrove kirin. Gotin:

— Ev ne teqîneke virt û vala ye. Dengê du cure çekan tê. Dengê keleşan û dengê G-3'yan.

Zûrezûr û borebora panzêrê, zaro-kên taxa nêzîkî tixûb ji xew hisyar kîrin. Dema yên ku ji qaçaxçîtiyê fêm dikin, dengê panzêrê bihîstîn, gotin: "Ma me negot şerekî duheliye..."

Bêbextî, di quncikê tarî û hêwî de bi kurtepiş tê honaşdin.

Derbasê muxbirçî li her du aliyê xwe nêrî, kes nedît. Ji bo ku baweriya wî baş pê were, dilê wî rehet bibe, ca-reke din li paş xwe nêrî. Lê kesî xuya nekir. Cixareyeke marlboro ji pakêtê derxist. Hesteyê îbelo ji berîka xwe anî der û cixare vêxist. Çend hilm lê dan. Hinekî bêhna wî hate ber. Bi dilekî ri-het û bi hêviya çend sed banqnotî kete hundirê tabûrê.

Dema her du nobedaren devê derî

çav li Derbaso kirin, gotin: "Dîsa Derbaso wê malika kê bişewitîne. Ka em binêrin bê Xwedê ji dayika kê stand."

Nobedaran hinekî tinazên xwe pê kîrin. Derbaso, cixare dan nobedaran û bi destê xwe vêxist. Nobedar got:

— Derbas Efendi, Yuzbaşî li odaya xwe ye. Tu dikarı herî hundir. Ez dinêrim kîfa te li te ye. Xwedê zane tu li şopa karekî hêja yî, heke bi ser bikevî me ji bîr nekî ha.

Dema ku Yuzbaşî çav li Derbaso kîr, got:

— Xêr e Derbaso? Dîsa kîfa te li te ye. Tiştek di bin te de heye.. De ji bin zimanê xwe derxe. Lawo diyar e ku te bêriya goştê berxan kiriye. Wele min ji zû de goştê berxan nexwariye. Xwedê bike ixbariya te rast derkeve. Kuro wele tu mîr i. Aferîn ji te re.

Derbaso wekî lawekî ku bi delalî mezin bûbe û sergiraniyan li malbata xwe bike axivî:

— Yuzbaşiyê min te şerm kir? Ez çavê te me. Ma qet ez serê xwe bi pariyê biçûk re dişenîm. Min gelek yuzbaşî yêne wekî te dewlemend kirine. Ew dewlemend vegeriyane Enedolê. Hê ji nameyên hinekan ji wan tê. Cem Usteymen û Nejdeto Yuzbaşî bi bertîl û "milan" avahîyen çend tebeq li Stenbolê lê kirin. Texsiyên nû standin.

Yuzbaşî hew xwe girt û got:

— Lawo de ka bibêje. Bes dirêj bike.

Yêni ku işev wê di sînor re derbas bibin kî ne? Barê wan ci ye? Saet in, çay e, pertal e ci ye?

Derbasê muxbir got:

— Nejdeto ye. Çardeh barkêşen wî hene. Ew bi xwe rézan e. Barê wan tev-lihev e. Morî, qehwe, kitan û hwd. Wê di navbera Gihesin û Wêsîkê re derbas bibin. Ji xeynî Nejdeto, du paşmîrên wî jî hene û biçek in. Nejdeto, mirove-kî derbnas e. Awirê wî tûj in. Nişanê ji qula derziyê digire. Desthilat e. Tu car natewe. Bila tu vê yekê baş bizanî. Heya te jê hebe.

Yêni li şevbihîrkan mafdar bûn. Şer dijwar, kemîn bêbext bû. Kemîneke mîrkuj hatibû çêkirin. Biryara kemînê, di quncikeke tarî de hatibû standin. Derbaso wekî gîskeki gûrî, hec ku di ser hêkan re bimeşe, bi diltirsiyeke dizê şevê ketibû odaya Yuzbaşî. Plan, hîle û fenêñ kemînê yek bi yek hatibû axaftin....

Nejdeto, sê çaran dorpêq qelaştin; di kemîna çaran de gule di bin çicika ali-yê cepê re kete hundir, di ser polê wî re derket derve. Birîn xedar, şev giran bû. Hêvi û mefer nebû. Bi xijiqandin xwe gihad cem taxa bajariyan. Li teniştâ mala Eliyê Necîm, taqet pê re nema. Xwîna ku ji birîna wî diherikî, bû go-leke biçûk.

Rengekî zer bi wî xortê berbihev, ket. Sorbûna hinarokên wî çû. Porê wî yê xelev û reş gjî û mij bû. Lîvâ wî ya qelaşti dijenî. Lî devlikeniya wî hê jî didomî... Paşmîrê wî bêhn çikiyayı, qerem şikandî, bi rengê miriyan li deri-yê hewşê da. A. Qorê derî lê vekir. Paşmîr xebera dilşewat, bi kurtepiş di guhê Apê Nejdeto de got: "Apo Nejdeto birîndar e. Me hev û din winda kir."

A. Qorê bi vê xebera malkambax şe-wisî. Hew xwe ragirt. Pirqînî pê ket. Rondik ji çavêñ wî barîn. Zeriyên ma-lê fêm kirin ku meseleyeke kezebşewat heye. Di serê sibê de dengê gîrî û qîrî-nen jinan bi ser taxê de belav bû.

Rûyê miriyan çawa ye. Çavêñ wan vekirî ne an gîrî!.. Em zarok wekî pi-singê pernişî ne. Jin bi gîriyan û fixan, destê zilaman bi şûn wan ve, şewqeyen wan xwe berdaye jêrê.

Me riya Nexwêşxaneya Nisêbînê girt. Gelo mirî dê bikevin xewna me? Cihekî hêwî, dîwar bi qirêj bû. Bêh-neke pîs dihat. Qîrînen jinan, li dîwarê betonî diketin û olan didan. Deng dubare dibû.

Dua û ayetên ku min ji ber kîrîne, di dilê xwe de min xwendin. Dileki min dibêje li rûyê Nejdeto nenêre, yê din dibêje divê tu binêri. Heç ku ez mecbûr im, li ser min wezîfe ye, divê ku ez birîna xedar bibinim.

Çar mirî. Çar miriyên rût û tazî, li ser betonê dirêjkirî. Çapan, bi ser wan de nixumandibûn. Yê ku dihat hundir, pêşî bi dizîka keviya çapan radikir, li rûyê yê mirî dinêri.

Di bin şewqa lembeya melûl de, diranê Nejdeto ê zêrin; di devê wî yê vekirî de zer dikir. Heç ku di xewneke giran de bû û dikenî. Wilo rihet û bêxem bû...

HESEN ZINAR

Wergera gotinê pêşîyan!

Bi her derketina berhemên bi kurdi –ne bi temamî, lê bi giştî mirov her çiqas këfx- weş bibe ji, ewqas ji tengezar dibe. Bi taybeti ji bo pirtûkan ev derbas dibe. Çunkî bi gelek kêmâsi û xeletiyen derdikevin pêşberî xwendevanan. Dibe ku hin kes ji bo xweparastinê hin maze- retan nîşan bidin û bibêjin: "Heta vêga zimanê kurdan qedexe bû, tu kesi ji xwendin û nivîsandina kurdi fêm nedî- kir û iro ji hin însan dest biavêjin nivî- sê û berheman derxin holê gelekî bas e." Belê, hin rastî di vê tesbitê de hene, lê divê mirov çavên xwe ji negire li hemberî xeletî û kêmasiyan. Ji ber ku ci berhemên ku iro derdikevin, dibin bingeha berhemên sibe. Ji ber wê yekê ji ci xebatê ku werin kiren, diyê bi za- nistî û bi baldarî amade bibin.

Di meha tîrmeha 1996'an de ji Weşanê Berfinê pirtûkeke bi kurdi-tirkî derket; "Gotinê Pêşiyên Kurda" (Kürt Atasözleri/ Kürtçe-Türkçe). Ev pirtûk ji aliyê Mustafa Borak ve hatiye amadekirin. Her çiqas Mustafa Borak di pêşgotina vê pirtûkê de gotiye: "Heya niha gotin û biwêjîn kurdi bi hev re ha- tine nivîsandin. Me di vê xebatê de ew ji hev cihê kirin" ji, dema mirov li na- va pirtûkê dinêre, dibinê ku gotinê pê- şîyan û biwêj tevî hev in. Li gorî ku Bi- rez Borak ji dibêje, diviyabû ji hev ci- hê bûbuna. Ji xeynî vê ji mirov rastî



metelokan (manî) ji tê, di vê pirtûkê de. Bi vî rengî metelok, biwêj û gotin teví hev bûne. Ji xeynî vî tiştî, hin kêmâsi û xeletiyen ku di vê pirtûkê de ne mirov dikare xal bi xal deyne holê.

1. Li gorî min kurd ne mecbûr in ku ci berhemên ku derdixin, wergerinîn tirkî ji. Divê kurd êdî xwe ji vî mantikî xelas bikin.

2. Di her zimanî de gotin, biwêj û metelok hene. Lê belê her gel li gorî çand, jiyan û mantika zimanê xwe wan diafirîne. Di zimanekî de gotin, biwêj

an ji metelok ne mimkûn e ku di zima- neki din de bi eynî awayî hebe. Ji ber wê ji ne rast e ku mirov gotinekê an ji biwêjekê yek bi yek li zimanekî din wergerîne. Mirov dikare ew biwêj an ji gotin di zimanekî din de çawa tê gotin, wê binivîse. Mînak: "Yek yek e, dudu komeg e. Bir birdir, iki dayanışmadır." Di tirkî de "Bir elin nesi var, iki elin se- si var" tê gotin. Dîsa "Xuyê şîri, heta pîri. Huy yaşlanıncaya dek sürer." Di tirkî de "Yedisinde neyse, yetmişinde de odur" tê gotin. Mirov dikare mîna- kan zêdetir bike.

3. Nivîskar bi xwe ji nedaye zanîn ku ev gotin, biwêj û metelok aîdî kîjan herêmê ne. Bi metodeke çawa ev lêko- lin kiriye.

4. Xeletî û kêmasiyên di warê zima- nê kurdi de hê ji navê pirtûkê dest pê dike: "Gotinê Pêşiyên Kurda". Li gorî gramerâ kurdi rastiya wê divê "Gotinê Pêşiyên Kurda" bûya. Ji xeynî vê, hema bêje di her rêtê de mirov rastî xeletiyen gramer û rastnivîsê tê.


5. Hin peyvîn ku hatine bikaranîn ji şaş hatine bikaranîn. Mînak:

"Yê ku derpiyê xwe bihêwsîne, wê birin li pişta xwe bibîne. Kilotunu (tumanımı) siki bağlayanın sırtı yara olur." Peyva hêwişin an ji hêwişandin bi áwayekî rast nehatiye bikaranîn. Maneya wê "muhafazekirin" e.

NUR-HAYAT

Tu kê diteqilînî, binê wî vala ye...

A. MELİK FIRAT



M in û General Namik Kemal Ersun hê ji albayıya wî ve hev nas dikir. Pişti wextan ji em car caran li malen hinek súbabayê mûteqawit ku nasen min bûn rastî hev dihatin.

Di sala 1982'an de hinek erbabêni siyasetê, yên ji Partiya Eedaletê (AP) hatin ba min, ji min re gotin: "Partiya me girtin. Em dixwazin ji xwe re partieneke din ava bikin; ji bo vê ji me re generalekî lazim e. Tu dikarî me bi Namik Kemal Ersun re bidî naskirin?"

Min ji got: "Ew leşker e, ji siyasetê hez nake, ji erbabêni siyasetê ji hez nake. Lê madem hûn dixwazin; yarbayekî mûteqawit heye, ez jê re bibêjîm bila were mala wî, herin pê re bipeyivin. "Di dawiyê de ez ji bi wan re çum. General di nav axaftina xwe de, ku ji berîka xwe Quran derxist, ez heyirîm... Yanê; hem di berîka xwe de Quranî digerînin, hem ji ku yek hukmeke Quranê bîne ziman, dibêjin: "Îrtîca ye, em wî bikujin..."

Li ser sazkirina partiyê ji "Ez ji partian, ji serokêni partian ên bajaran, ji serokêni oçaxan hez nakim! Ku ez bibime serokê partiya we ji, bi wan kesan re qise nakim" got û li gotina xwe zêde kir: "Jixwe di welatê me de, demokrasî nemaye. Demokrasî di wextê Atatürk û İsmet Paşa de hebû... Pişti wan dejenerê bû!"

Tesawir bikin ku yek di nav artêşê de bi

dehsalan xebatê dike, dibe "paşa" û dema van gotinan ji dibêje, ne ku hîleyan dike, wer bawer dike... Baweriya wî ew e ku rejîma Atatürk û İsmet Paşa demokrasî ye. Ew mirovên ku mantiqê wan, idraka wan, mantalîteya wan ev be, wê ji bo vî welatî ci xêr jê bê? Ez tim dibêjim; di nav tîrkan de, yê ku behsa misilmantiyê ji dike, yê ku behsa marksîmî ji dike, tu dibînî ku têkiliyên wî bi gotinê wî re tune; di siyasetê de tiştîn din dikin. Ne yên ku bi misilmantiyê qise dikin misilman in; ne yên ku bi marksîstî qise dikin marksîst in..

Ev cil sal e ku ez di nav wan de me. Ya ku min fêm kiriye; bi van mirovan re tişt nare serî... Pir zor e. Lê ku yekî diktator û jêhâtî rabe, dikare van bîne rî!.. ji bo ci vê dibêjim?

Rojekê li meclîsê hinekî mebûsên DYP'ê hatin cem min, gotin: "Edî hikûmet bi nermî nêzîkahîyî li pirsgira kuî dike. Te ji partiya me îstîfa nekira belkî faydeya we çêbûya, me ev mesele ber bi çareskerinê ve bibira. Di vî wan de pêşveçûn hene..."

Ez bi wan keniyam...

Ku sebebê kenê pirsin, min ev bersiv da wan: "Nêzîkahîya nerm, pêşveçûn... ev hîkaye ne, çîrok in. Baweriya min ev e; ku diktatorekî rabe, darbeyê bike û ji we re bibêje 'bibin demokrat!' mimkûn e ku hûn bibin demokrat. Lê bi xwesteka xwe, hûn tu carî nabin... Ku yek serê we jê dike, malê we talan dike, hûn ji wê zîlm û zorê ibret nagîrin, di cîhekî de ditelin, dibêjin em ji van tiştan bikin. Yanê; hûn nabêjin tiştîn ku hatin serê me, bila neyîn serê însanîn din. Hûn nabêjin; bila aheng û edalet were welatê me. Ev mantiq, ev tasawir û ev mantalîte di cewherê we de tune.."

Ez dizanim; ev gotin abes e. Diktator û bibêjin; bibin demokrat!.. Ev ne mimkûn e. Gotina min ew e, ku di nav tîrkan de tişt bi

nermî, başî û qencî çareser nabin.

Mînaka Süleyman Demirel li ber çavan e:

Ew du-sê caran bi darbeyan ket.. Dema di wê dawiyê de ket, heqê wî yê siyâsi deh sal ji destê wî girtin. Li welat digeriya, nelet li rejîm dianî. Ji Quranê ayet dixwendin; behsa demokrasîyê, behsa edaleta îçtimâî dîkir. Gelek marksîstan ji pê bawer kirin. Min ji got; ev sê car in ku lê dixin, dikeve erdê, dike ku hişê wî hatibe serê wî, dema were îktîdarê belkî, li edalet û demokrasîyê xwedî derkeve. Lê çû bû notirvanê 'Qanûna Bingehîn' a ku Kenan Evren çekiribû. Îcar dixe paşila xwe, mîna Tewrat û Încîl û Quranê... Halwekî ev qanûna bingehîn bû, ku ew deh salan ji siyasetê dûr xistibû...

Tu kê diteqilînî, binê wî vala ye...

Niha tîrlyonê Demirel hene. Yê jina wî Nazmiye Xanim; tîrlyonê wê hene. Bûrayê wî Ali Şener bûye multîrlyoner... Birayê wî Şevket û Ali Demirel werê ne, birazîn wî Yahya û Murat Demirel werê ne... Îcar li ser xwîna zarokên vî, welatî cirît diavêjin. Hin caran çavên xwe sor dike, qirika xwe diwerimîne, mîna wan baqîn ku qureqr dikin:

"Em yek xîcîkekî vî welatî nadîne kesî!.."

Halwekî bi qasî xîcîkekî di vî welatî de ked û emega wan tune. Mêze bikin; xorîn ku tênu kuştin (ci ji leşkeran û ci ji wan ên çiyê) tev zarokên feqîr û belengazan in. Dema mirov li televizyonê mîze dike ji, dibîne: Dayîkên leşkeran gundiyen sergirti ne, yên din ji feqîr û belengazên kurdan in..

Van zaliman bi derewan, mîlet ji bêhiş kirine; ku rastî û şâsiyê ji hev û du dernaxin..

Dema ez vân dibêjim, hinek rewşenbirîn tîrkan dixeýdin. Baş e, ku îtîraza we heye, gotinê min vala derxin. Ku hûn bi hereketen xwe, gotinê min vala derxin, ez këfxweş dibim... Lê hêviya min tune.

Hêviya min tenê bi Xwedê maye.

Sahmeran



Wesanaxane Sarayê çiroka Sahmeran ve hatiye berhevkinin çap kiriye. Pirtûk cil rûpel e û wêneyen wê ji, ji hêla Fernando Donaire ve hatine xêzkirin. Li ser berga dawî der barê çiroka Sahmarenê ev agahi hene:

"Di nav gelî de, dibêjîn ku Sahmeran xortekî çeleng û aza bû. Wî seri li hemberî padişahî dewranê rakiribû. (...) wî li ber padişahî, xwe bi sun de kişandiye û ketiye bin erdê. Bi salan wekî maran di kun û skeftan de maye, nîv laşê wî bûye mar (...) Paşê mirîye û keça wî ya dêmar, bûye şahbanûya maran. Lî navê şahmeran her ji keça wî re maye."

Li ser çiroka şahmeranê, bi awayekî din ji têtê çêlkirin, ku "pişti daketina peyamber Ademî ser rûyê erdê, di navbera ademizad û maran de, dijminahî peyda bûye. Mar bûne sedem ku Adem ji bihuşte hatiye derxistin. Ji wê rojê, mar û mirov bûne dijminê hev. (...)"

Dalagatan 425 113 23/Stockholm Sweden


Ji Elbîstanê bi texmîna 15 km'yi
bi rojava de gundek heye; navê
wi Qere Elbîstan e. Li giraveke
di nav Çemê Ceyhanê de hatiye
avakirin. Li hawirdora wê giravê çem
diherike. Bi pireke (maxeke) ji beştan
çêkirî Gund bi peravê wê ve girêdayî
ye. Gundî, bi terş û talan di ser wê pirê
re derbasi Gund dibin. Ango di rewseke
nexwes de ne.

Dewletê ji wan re li hevraza çiya, avahîyan nûjen ava kiribûn, lê gundiyan terki gundê xwe nekirin, neketin wan avahîyan, niha giş kavil bûne.

Rojekê min sedema avakirina wi gundî li giravê ji mirovekî ku li vî Gundî dihêwirî pirsî. Ewîlî serê xwe berda ber xwe, pâşê serê xwe rakir, hinek bêşîşî û got: "Wele şerm e, lê madem ev çend bala te kişandiye, ezê sedema gund ku li vê giravê hatiye avakirin ji te re rawe bikim." Dest pê kir, got:

"Berê bav û bapîrên me li Çiyayê Nûrheqê serbest û aza dijiyan, haya wan jî dewlet û gerdûnê nîn bû, dan û standina wan bi-hev û din re bû. Bi ras-tî haya dewletê jî ji wan nîn bû. Rojekê dewlet bi wan hay dibe ku li gundekî serê çiya hêwirîne û bêbac dijîn. Ji bo komkirina bac û qançora sewalan tah-sildarekî dişînin gund. Tahsildar peya, di bin gelek asteng û aloziyan de, bi hal-kekî ne xwes, êvarê digihîje gund. De-rengiya şevê, şîva wî amade dikin, li ber datînin. Du xort, her yek darek di

XELAT...



Bersiva Xaçepirsê (26)


Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihijin
me, emê wan binirxının û bi riyâ
pişkê li 10 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya
28'an kitêba Mustafa Borak
“Gotinê Pêşiyên Kurda” ye

*Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin,
divê hûn "Peyva Vegarî" di nava
qutiyen li bin xaçepirsê de
binivîsin û tevi adresa xwe ji me
re bisinîn.*

Kes n ku xelata xa epirsa 26'an, kit ba Helim Y siv "Mir  Ranazin" qezenc kirine: Hizniye Qaso/Batman Muhyettin Aksin/Van, Dilber/Izmir, Rifa  Kaya/Antep Bayram Toplu/Antep, A.Kadir Akbulut/Izmir, Seyfettin S y er/Birecik, Dilan Sel uk/Hatay, Abdullah Oktay/Siirt, Ahmet G l/Adiyaman.

Dîroka Qere Elbîstanê



dest wan de, li ser serê wî radiwestin.
Mezinê gund dibêje, fermo ser şîvê
Tahsîldar dibêje:

*'Apo, gelo ez bixwim ev xort wê li
min bidin an nexwim, gelek bixwim wê
li min bidin an hindik, ka ji min re
bibéje, ev ci dar in, ev ci gef û gur e?'*

Mezinê gund dibesişe û dibêje : 'Na
birazi na, netirse; tu kerem bike şiva
xwe bixwe. Li gundê me misk zehf in.

ji bo ku nekevin ber te şiva te neherimî
nin, ew xorx parêzkariya şiva te dikin.

Tahsildar pişti komkirina bac û qan
çorê ji wan re dibêje: "Bi xêr saleke di
ku ez werim, ez dê ji we re derman
mişkan bînim."

Sal dizivire, dema komkirina bac qançorê ye, yê tahsîldar pisikekê b xwe re dibe û diçe gund. Dema şîva w amade dikin dîsa du xort radihêjin co

yên xwe di ser serê wî re disekezin. Ji xortan re dibêje: "Hûn zehmet nekin, va ye min dermânê wan anîye." Pisikê ji torbe derdixe, berî odê dide; dibe miyew miyewa pisikê, müşkekî li vir digire yekî li wir, yê din bi qulan de direvin. Tahsîldar, pisikê diyarî wan dike. Gundî dora xwe datînin ser pisikê. Rojekê li malekê dihêwîre; qira müşkan tîne. Pisika wan zehf qelew dibe; dibe mîna keftareki, mîratmayî.

Rojekê pisik li ser dîwârê hewsekê dimelise; her du lepêñ xwe dialêse û di sîngâ xwe dide. Gundî li hev dicivin; li pisikê temaşe dikin, lê rewşa wê ne baş dibînin. Ji hev û din dipirsin, gelo ev mahlûk çi dike û çi dixwêze. Mezinê gund baş bala xwe dide pisikê û dûv re dibêje:

"Ma hûn ker in an debeng in. Va ye
baş jê tê fêmkirin ku ceng û pevçûnê ji
me dixwaze. Dibêje min qira mişkan
aniye, ji fro û pê ve dora we ye."

Gundi dibejin: "Kalo, aqilekî bide me." Kalo li wan vedigerine: "Ma aqil ji wê re dibe. Îsev alavên sivik hilgirin ku di tariya şevê de em ji ber bar bicivîmin. Pêsi rizgariya me pêwist e."

Ew bi dizîka ji ber pisîkê bar dikin. Dotira rojê têن ber Çemê Ceyhanê. Dema ev girav dibînin zehf kêfa wan jê re tê û derbasi giravê dibin. Ew roj û ev roj di vê giravê de hêşîr mane.”

I. OMERÎ

XACEPIRSA BIXELAT (28)

Hilpişkin		Cade		Milet		Di dîrokê de dewletek		Sebir		Bajar bî erebi
		Bizot						Pozitif		
Ufq				Naveki mérân	→				↓	
Rutbeya serbaz	4*			2		Goleke li Rûsyayê	→			
Rêdstin-eke Baskî Agir				Di notayê de sekîn Kesê dî wêne de	→	Dîri	↓	Alif	6	Pêspirtîkek
		Filozofeki -inglîz	→		↓					Firewnê mezin
		Geli				5				↓
Rojek				Gest	→			Pêxemberek Sewaleke kedî	→	
Nexwesi-nék				Meta		8				
					↓	Kar	→			
						Belê				
Kevirek bî buha	Mane	1					Zik			
	Ling									
				Naveki yew-nanyan	→			7		
Eşîr	→	3	Dotina pez	→						

PEYVA VEŞARI



1 2 3 4 5 6 7 8



A. KADIR GİGECİ...

Zimanê zikmakî kesayetiya mirov xurt dike

Ji bo ku zimanê gelên bindest neyê qedexekirin, rêxistinê navneteweyî bi hin peymanan, rê li ber welatên serdest girtine. Her wiha li gorî Peymana Cenewreyê ya Mafêni Mirovan li ku dera dinyayê dibe bila bibe, mafê zarokan heye ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehî bibînin.

Türkiyeyê di sala 1954'an de Peymana Mafêni Mirovan a Ewrûpayê û Peymana Mafêni Mirovan a Cenewreyê, di sala 1988'an de jî Peymana Parisê pejirand, lê hê jî bi zimanê kurdî perwerdehî û férbûn qedexe ye.

Mebest diyar e, heke zimanê geleki azad be ew gel jî bi awayekî, xwe azad dike. Di dibistanê tîrkan de bi taybetî li ser vê mijarê tê sekînîn. Plan û program li gorî kitêbên ku dewletê derxistîne tê çêkirin. Kes nikare derkeve derveyî vê plan û programê. Armanca dewletê, perwerdehiya îdeolojiya fermî ye û jiholêrakirina şexsiyeta kurd e.

Girîngiya zimanê perwerdehîyê

Zarokekî ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiye nebe û nasnameya wî/wê were înkarkirin, di şexsiyeta wan kesan de nakokiyek pêk tê. Psîkolojiya pir zarokênu bi zimanê tîrkî perwerdehî bûne van nakokiyen hilnagire, pîriyên wan dev ji dibistanê berdidin. Mazereta herî mezin jî dibêjin "Ez jê fêm nakin, ez bi ser nakevîm".

Ev pirsgirêk di şexsiyete de xisleten nû diafiîne. Wekî derewkirin, ji malê revin, dizikirin. Di vê pêvajoyê de nexweşîyen psîkolojîk, kesaniyeteke asabî dertê holê. Li hêla din dîsa zarokênu bi vî rengî ku ji dibistanan direvin, heke pîkutiya malbatê jî li ser zêde hebe, wê gavê jî şexsiyeteke bêdeng ku her tiştî qebûl dike, nikare bi mirovan re têkiliyan dayne, jiyanê bi tenê

li dora malbatâ xwe û gundê xwe an jî bajarê xwe dibîne. Ji wî/wê re bi tenê pirsgirêka zikê xwetêr kirin û li jiyânê mayîn heye, ji bili van tiştan tu tişt wî/wê eleqedar nake. Jixwe daxwaz jî ev e.

Berpirsiya dê û bavan

Zarokênu li dibistanê berdewam dîkin jî, di şexsiyeten wan de guherînê nû çedîbin. Wekî; kurdbûna xwe qebûl nake, xwe weki tîrkekî dibîne, an jî kurdîti û tîrkîti ji bo wan muhîm nîn e, ew misilman in, qaşo enternasyonalîst in. Misilman jî tev bira ne, xwe di nav oldarêner fermî de dibînin. Ev jî kesaniyeta wan diqêdîne, wan li hemberî bûyeran, li hemberî civakê bêdeng, bêşexsiyeteke derewkar, dûri jiyanê ku bi tenê li berjewendiyen şexsî difikire dertê pêş.

Dê û bav hewce ye zarokênu di vê rewşê de bi awayekî din perwerde bikin, zarokênu bi şexsiyeteke xwedî rûmet bigihîjînin. Guh bidine her pirsgirêken wan, wan bikin şexsekî ciyakê, bi her awayî bi civakê ve girê bidin. Bergeha jiyanâ wan fireh bikin.

Sistema perwerdekirina bi zimanê tîrkî, van pirsgirêkan derdixe pêş ji bo zarokênu kurd û yên din.

Bi zimanê zikmakî perwerdehiya zarokan bi her awayî şexsiyeteke xurt dike, zêdetir şexsiyeteke li hemberî civakê berpirs dike. Her tişt bi vî awayî eşkere ye. Lî mirov nikare bibêje ji sedî sed her kes dikeve rewşêke wiha, kesen xwe ji vê psîkolojiye xelas dîkin jî pir in. Lî îdeolojiya fermî piranî bi vê kirinê digihîje armanca xwe.

METİN AKSOY

WELAT

Rojnameya Hesfeyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayinehik
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerfindeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karêñ
Nivîsaran
(Yazi İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
(0 212)
251 90 13
ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
Biryay Dağıtım
(BİRYAY)
NÜNERİTYEN ME

(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Gîşî
yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsif
96-321720568

Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695
Hannover:

Selim Biçük
49-5721-81360
Munchen:

Mahmut Gergerli
49-871-670884
Bruksel:

Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:

Robin Rewşen
46-8-7510564
Bon:

Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Hollanda:

Remzi İlhan
312 06 32 31 28
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

E vînê

zora cezayê giran bir

hezkirin jiyan e, evîndarî ji jîndarbûn e. Evîna birûmet kesayeteke xurt dixwaze. Hemû kes li gorî xurtbûna kesayeta xwe wateyê dide evînê.

Gava mirov li jiyanan civakan dinêre, evînî bi du hêla xwe xuya dibe:

Yek jê yên ku miradêن wan bi hev re nebüye negihaye mirazê xwe. Bi gotineke din evînî bi zewacê neqediyaye. Mînakêن di vê qadê de pir in. Ji civaka kurdan Mem û Zin mînakeke mezin û pîroz e. Di vî warî de di nav kurdan de nifireke herî mezin û bixof heye. Ew nifireke ku gava tê gotin, giyansaziya mirov diheje:

"Mirazê te di qirika te de bimîne."

Ya din ji kesen ku bi mirazê xwe şad dibe ye. Lewre li ser ên ku digihêjin mirazê xwe, qet tiştek nehatiye nîvîsandin. Van xoşewistan wekî mîrxas-en bênav têne zanîn.

Mirov dikare bibêje yên digihêjin mirazê xwe û yên nagihêjin mirazê xwe ji qelenê evînê wekî xwinê didin.

Evîn, xwediyyê têkoşîna xurt

Di dirok û civakê de tê xuyakirin ku evîndarî têkoşîneke herî gur divê. Yanê evîn kesayeta mirov taqî dike, wekî kesen şoreşger dîl dikevin desten neyar û di nav lepêñ wî de azmûneke girîng derbas dîkin. Hinek kes li vir dibin şoreşgerên mezin û navdar û hinek ji dibin itirafkar.

Di warê evîn de têkoşîneke xurt û baweriyeke qewîn bi biryârî xwişka Nurcan (Nurcan Akalîn) daye. Bi Hemîd Akalîn re nîşanê pêk tîne. Cuntaya 12'ye rezberê diqewime. Nurcan Xanim, dibêje:

"Gava kû hatîn Hemîd girtin berî derbeya leşkerî bi 8 mehan bû. Wê gavê em dergîst bûn. Ne malbata wî û ne ya min-bawer dikir ku ewê bê berdan."

Lewre ew ji doza PKK'ê hatibûl girtin. Lé min tu car baweriya xwe neşikand. Min di dilê xwe de digit gava ku Hemîd bimire, bila ez ji bimirim."

Tore xwestekan di dilan de dihêle

Zilamê wê Hemîd 12 salan di girtîgehê de radîzê, di vê pêvajoyê de ew qet neçûye hêvdîtina wî ji. Me jê pîrsî ku çîma neçûye serdana wî? Wê got:

"Hin em ne zewicî bûn. Şerm bû ez biçûyama."

Nîha ji zewaca wan, bi navê wekî Birûsk, Bager û Bawer sê zarokêن wan hene.

Xwişka Nurcan dibêje:

"Rewg ú mizgîniya vê evînê ev zarok in."

Hemîd û Nurcan li Sokeya Aydinê di kuzixêkî de rûdinin û jiyanan wan bi dilgermî û dilxwesi didome.

Evîna wan zora cezayê ku dewleta tîrk daye wan, biriye.

Di dirok û civakê de tê xuyakirin ku evîndarî têkoşîneke herî gur divê. Yanê evîn kesayeta mirov taqî dike. Wekî kesen şoreşger ku dîl dikevin desten neyar û di nav lepêñ wî de azmûneke girîng derbas dîkin..

